

**Kamiran
Alî
Bedirxan**

Rûpel 12



Li Zindana Amedê girtiyan serî hildan, esnafên Amedê jî kepenkên xwe girtin.

Amedê silav da meclîsê



Bi qerera Meclîsa Kurd a Neteweyî li gelek deverên Kurdistanê, Tirkîyê û Ewrûpa tevî dayikan bi şahî û cîlan grevên birçibûnê çêdibin.

✓ Grewa birçibûnê ya ku Mebûsên Meclîsa Neteweyî ji bo protestokirina kirinên dewleta Tirk li Brukselê li dar xistin, li Kurdistanê û li metropolên Tirk di nav Kurdan de, bi livbaziyan girseyî hate destekkirin û li gelek bajarên bêdengiyan ku ji demkê ve didomiya şikand.

✓ Bajarê Amedê jî, tevî hemû komployên TC'ê rabû ser piyan û desteka xwe bi girtina kepenkan û bojkota dibistanan nîşan da. Ji 12 hezar esnafên Amedê, ji bilî çend sazîyan dewletê hemû dikanên xwe girtin. Xwendevan û girtiyên Girtîgeha Amedê tevî gelê xwe silavên germ şandin ji Mebûsên Meclîsa Neteweyî re.

Rûpel 8

Gerîla nasnameyên TC dicivîne

✓ Di van mehên dawî de, bi taybetê li herêma Xerzan gerîla otobus û erebeyan disekinînin û nasnameyê xelkê dicivînin. Min sebaba komkirina nasnameyan ji Hesên pirsî, wî wiha şîrove kir: "Ji ber nepejirandina (neqebûlkirina) TC'ê ye. Bi vê komkirinê, em gelê xwe ji nasnameya TC'ê xelas dikin"

Rûpel 3

Polîs buroya me îşxal kir

✓ Polîsên ji şubeya li dijî terore girtin ser rojnameya me, rojnameya Yenî Ülke, kovara Özgür Halk, Weşanxaneya Melsa û MKM'ê. Li van sazî û rojnameyan polîsan dest danîn ser arşiv, pirtûk, klavye û eşyayên metbexa Özgür Halk'ê.

Rûpel 5

**Ji awirên
Medîna
Emer re**

*Rizgar
ji Moskovê
dinivîse*

Rûpel 13



REWS



Abdullah Keskin

Şirketa belavkirinê Welat belav nake

Dewlet serhildana gelê Kurd wek serhildanên berê dinirxîne û dibêje; "Berî niha 28 serhildan çêbûn. Ev jî serhildana 29'an e. Emê vê serhildanê jî bi xwîn û barûdê bifetisînin." Li gorî van nirxandinên xwe dixwazin gelê Kurd jî dinyayê tecrîd bikin. Dizanin ku, şertên 1990'an ne wek ên 1925-30'an e. Dixwazin piştî 60-70 salî re eynî şertan çêbikin.

Îro dewlet ji her alî ve êrîşê gelê Kurd dike. Tehamula wan ji Kurdayetiye re nîn e. Li Kurdistanê ,derveyî Kurdistanê êrîş didomin. Ji malbata heta bi partiyên, ji rojnameyan heta bi komel û sazgehê demokratîk hedefa wan in.

Rojnameya me Welat jî nesîbê xwe ji van polîtîkayên zordest distî-

ne. Pêşî çî kirin? Xwestin ku me ji civaka Kurd dûr bixin. Dixwestin me di çarçoveyê teng de heps bikin. Fêde nekir. Pişt re nûçevan û alîkarên me girtin. Tiştê safî nebû. Nivîskarên me yên wek Apê Musa, Hüseyin Deniz kuştin. Bi kuştinê jî çavên me neberrîn. Dû re nehiştin rojnameya me li welatê me belav bibe.

Ji vê hejmara di destê we de û pê ve "Birleşik Dağıtım" êdî hew Welat belav dike. Ev 2-3 meh e li Kurdistanê belav nedikirin. Ji vir û pê ve li Tirkîyê jî belav nake. Li gorî imkanên xwe emê rojnameya xwe, ji vir û pê ve belav bikin. Di hejmarên pêşîya me de emê navnîşanê deverên ku Welat lê were firotin binivîsin.

Welat îro li dinyayê tev belav dibe lê li bakurê Kurdistanê qedexe ye. Dest li ser rojnameyên ku em bi postê ji Başûr, Sûrî û Ewropa re dişînin datînin.

Berî niha, di hejmara 44'an di ji bo Welat me dîtînen xwendevanên xwe pirsî bû. Bi rastî di vê dema dijwar de, em nikarin rûpelan zêde bikin. Jixwe, ji vê hejmara di destê we de û pê ve "Birleşik Dağıtım" êdî hew Welat belav dike. Ev 2-3 meh e li Kurdistanê belav nedikirin. Ji vir û pê ve li Tirkîyê jî belav nake. Li gorî imkanên xwe emê rojnameya xwe, ji vir û pê ve belav bikin. Di hejmarên pêşîya me de emê navnîşanê deverên ku Welat lê were firotin binivîsin.

Marîfetên dewletê ne ev tenê ne. Roja sêşemê hevalê me Mazhar (Berpîrsiyarê Nivîsaran) piştî ji buroyê derket tê girtin. Hevalê me şevê bê sebeb li qereqolê di hucrê de ma, roja din berdan.

Roja çarşemê jî 15-20 polisên şubeya siyasî bi çekan saetekê buroya me îşxal kirin. Fotograf û negatîvên arşîvê dizîn. Li ser vê bûyerê me ji çapemeniyê re daxuyaniyek şand. Bala wan nekişand. Rêxistina Efû ya Navneteweyî bi daxuyaniyekê bûyerê protesto kir.

Bi vê hejmarê, me sala xwe ya yekemîn tamam kir. Di hejmara 53'an de, tevî hev dîtînen bimînin di xweşiyê de.

FERHENGOK

Alozi: Gêş, tevlihevî, dijwarî
 Bajarvanî: Şarezatî, medeniyet
 Balçîqewêr: (Uçaksavar)
 Bêtêl: Têlsiz
 Cerd: (Baskin)
 Çandinî: Zireat (Tanm)
 Çespîn: Tetbîq (Uygulama)
 Devang: Qalpax
 Dilvîn: His, pejn (Duygu)
 Dilzîz: Kesê ku pîrr bi hisiyat e (Duygusal)
 Dilêr: Dilawer, wêrek, cesûr
 Dûs: Rade, pile, derece
 Efsêr: Zabit, astsubay
 Fericandin: Temeşekirin, seyrkirin
 Gengêşî: Guftûgo, munaqeshe
 Hedan: Aram, sebir
 Helwest: Tawir (Tavir)
 Helwestkar: Kesê bi helwest (Duyarlı)
 Heyam: Dem, wext
 Hilbirîn: İstihsal (Üretim)
 Honandin: Mûnandin (Örmek)
 Kat: Heyam, dem, wext
 Kelek: (Kayık, sal)
 Keştî: Gemî
 Mehrîcan: Festîwal, cejn
 Meterîs: Mewzî, kozîk
 Perwerde: Hêvotin, talîm (Eğitim)
 Posîde: Bandor, hikarî, tesîr
 Qirdîk: Keşmer, palyaço
 Rîst: Rol
 Serbaz: Subay
 Şop: Rêç
 Şopandin: Taqîbkirin
 Şopîn: (İzlenim)
 Xwerîstî: Xwezayî, tabîî (Doğal)
 Xwepêşandan: Miting

Kuştina hemû dayîkên Kurdan

Nûnerên herêma Stuttgartê yên ku ji bo Konferansa Meclîsa Neteweyî ya Kurdistan hatine hilbijartin, amadehiya çûna konferansê dikin. Me ji bo konferansê gelek mirovên Alman vewwendiyê da ku di cihê hilbijartina meclîsê bibînin.

Prof. Hausmann dixwaze bi me re were Konferansa Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê. Ew bi xwe li Zanîngeha Stgt'ê, li ser lamdwirtschaftê (çandinî, ziraet) lêkolînan dike. Her çiqas min û Prof. Hausmann gelek caran telefonê hev kiribe jî, lê em bi kesayetî hev nas nakin. Bi vê sedemê de em hev nas bikin.

Em û Prof. Hausmann serê sibehê, saet di 6'an de hev dibînin û berê xwe didin bajarê Gießenê, ku navê wî bajarî, jî îro û pê ve di dîroka Kurdistanê de bê bîranîn û nivîsîn.

Em û nûnerên konferansê heya berdestî sibehê, bi hev re li ser Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê mijûl bûn. Ji ber vê yekê xewa hevalan tê û ew li dawîya otomobîlê radikevin. Ez û Prof. Hausman dest bi sohbetê dikin.

Di van rojan de mesela herî aktuel a Mollnê bû. Li Mollnê sê mirovên Tirk ji aliyê faşîstên Almanî ve hatibûn şewitandin. Ez bi xwe ve bûyerê li dijî mirovahiyê dibînim. Lê gelê Al-

manî bi pîranî li hemberî van faşîstan bêdeng nema. Bi sedan hezar mirov daketin qad û taxan û piştgiya xwe bi biyanîyan re dan diyarkirin. Lê li welatê min, du roj berê mirovek li Batmanê, ji ber belavkirina rojnameya Özgür Gündemê, tevî otomobîla xwe hatibû şewitandin. Her roj gundên Kurdan ji alî leşkerên Tirkan ve tînin şewitandin, bi dehan jin, zarok tînin kuştin. Bi tenê îsal deh rojnamevan ji alî dewleta Tirk ve hatin kuştin.

Lê çî mixabin ku gelê Tirk li hemberî van bûyeran bêdeng dimîne. Ev yek jî cudabûna civaka Tirk û Almanî nîşanê me dide dibêjim.

-Tu rast dibêjî, ez jî mîna te diramim. Lê di wan bûyeran de jî kêmasiya me Almanan jî heye. Divê gelê Alman li hember bûyerên ku li welatê wan pêk tînin bêdeng nemînin. Li vir jî û li wir jî mirov tînin şewitandin. Em li hemberî bûyerên li vira derdikevin û li hemberî bûyerên ku li welatê we diqewime jî bêdeng dimînin. Li vira kêmasiya me hema hema mîna kêmasiya Tirkan e" dibêje Prof. Hausman.

Em herdu jî demekê bêdeng dimînin. Dû re ez jê dipirsim: "We Kurdan çawa nas kir?"

-Min cara pêşî pirtûka

Karl May a bi navê "Durch den wilden Kurdistan" (Di nava Kurdistanê Hov de) xwend. Dû re min gelek pirtûk û lêkolînan din jî, yên li ser Kurdan xwend û zanibûna xwe bi pêş ve bir. Van salên dawî, di nava zanîngeha me û Edenê de tîkîlî hatin danîn û me xwest li ser projeya GAP'ê lêkolînan çêbikin.

Bi çûn û hatina min a Tirkiye û Kurdistanê, jîyan û rewşa Kurdan tesîreke mezin li min kir. Em carek çûn Serêkaniyê (Ceylanpınar). Lê ji Amedê vir ve, mirov serê her çend kilometreyan rastî leşkeran dihat. Riyan kontrol dikirin û li ber qereqolan bi torbeyên qûmê û kevîran kozîkan ava kiribûn.

Em ber bi êvarê gihîyan gundekî Serêkaniyê. Piştî xwarinê min ji hevalên xwe yên Profesorên Tirk pirsî: "Em bîskêkê derkevin nava gund bigerin." Wan jî, ji min re got: "Ma tu dînî, li wira şer heye û ev gund jî gundên Kurdan in. Karin tiştêkî binin serê me."

Demek bi şûrt ve jî, li gundekî jî gundê me wê de, di nav gerîlayên Kurd û leşkerên Tirkan de şer derket.

Şer bi qasî saetekê domiya. Piştî şer min û Profesorên Tirk li ser meseleya Kurdî sohbet kir. Min ji wan pirsî: "Hûnê vê meseleyê çawa çareser bi-

kin?" Profesorên Tirkan li hev nêrîn, dû re yê ku zanîngehê li Amerîka qedandibû wiha bersiva min da: "Ev pirs bi yek metodekê tê çareser kirin. Ew jî kuştina hemû dayîkên Kurdan e." Gava wî wiha got, ez pîrr sar bûm û xwêdaneke cemidî hate laşê min. Ez bêdeng mam. Dawiyê min ji xwe re got: "Ev profesor e, ji bo Kurdan wiha difikire. Gelo yekî leşker û generalek çawa difikire?" Bi vegeza Almanya re min tîkîliyên xwe ji wan birrî. Li Zanîngeha Stgt bi konferansêkê min ew protesto kirin.

Êdî tu tiştêkî min bigota nemabû. Bi qandî ji destê min tê ez alîkariya Kurdan dikim. Dayîkên Kurdistanê, dijmin baş dizane ku hûn bûne bîngeha parastina neteweyî ya Kurdistanê. We bi sed salan vir ve ziman, wêje û çanda Kurdî parastiyê û aniyê dema îro. Divê hûn îro pîrrtir li neteweya xwe xwedî derkevin. Divê her dayîkeke Kurd bibe zanîngeha welatparêziyê.

Şerê serxwebûn û azadiyê îro, ji hemû deman pêştir ketiyê û xelasbûna we dayîkên Kurdan jî di vî şerê bi rûmet de ye. Bila profesor û generalên Tirkan zanibûn ku, bi kuştina we pîrsa gelê Kurdî nayê çareser kirin."

Kerim Botan

Dîlbera dil

Dîlbera çendî rind î
 Jîndara ser bilind î
 Horiya buhiştî min
 Nû bûka xweş lewend î

Dîlbera taca cîhan
 Evîna barê dîlan
 Dilniyaz û şerker im
 Her dem ban kim Kurdistan

Dev xwînê rû befrîne
 Reng cewherê çav şîne
 Her dixwînim evîne
 Ez bûm Mem û tu Zîne

Gava dîlber bîndest be
 Xortê ciwan bê şer be
 Wey ded eyb û mixabin
 Bila Ferhad tune be

Bo te dibêm Kurdistan
 Yara min e niştîman
 Xebat û lebata min
 Yan dîlbera yan neman

Ferhad Masîro/ Heleb

Ji xwendevanên Welat re!

Ji vê hejmarê pê ve şirketa belavkirinê rojnameya me belav nake. Ji ber vê yekê êdî bi imkanên xwe û bi alîkariya xwendevanên xwe wê Welat bê belavkirin. Xwendevanên me yên ku dixwazin di belavkirina Welat te alîkariyê bi me re bike; ji kerema xwe re bila navnîşan û telefona xwe ji me re bişeynin.

Bi berpirsiyarê ARGK'ê yê dora Misircê re sohbetek

Gerîla nasnameyên TC dicivîne

Di van mehên dawî de, bi taybetê li herêma Xerzan gerîla otobus û erebeyan disekinînin û nasnameyê xelkê dicivînin. Min sebaba komkirina nasnameyan ji Hesen pirsî, wî wiha şîrove kir: "Ji ber nepejirandina (neqebûlkirina) TC'ê ye. Bi vê komkirinê, em gelê xwe ji nasnameya TC'ê xelas dikin

Heta îro, bi gerilayên PKK'ê re gelek roportaj hatine kirin û weşandin, lê ji ber ku ev hêz roj bi roj xurttir dibe û wê heta şoreşê têkoşinê bidomîne lazim e gelê me vê hêzê ji her aliyê ve nas bike û ji pêşveçûnê û kirinên wan haydar bibe, jiyana wan, fikrên wan, daxwazên wan û şertên ku tê de dijîn bibîne. Ji ber vî awayî, bi wan re çiqas zehf roportaj çêbibin li cih e û pêwîst e.

Di vê hejmarê de em sohbetek berpirsiyarê gerilayên dora Misircê pêşkêşî xwendevanên xwe dikin. Hesen qumandarekî pîrr ciwan e, piştî liseyê diqedîne beşdarê Partiyê dibe, ev çar-pênc sal in ku, vê jiyana têkoşeriyê didomîne.


Dema me daxwazek roportajê li heval Hesen kir, ev daxwaz her çiqas li xweşa wî hat jî, ne li cih dît; xwest ku em bi heval İsmail re roportaj bikin (Heval İsmail Qumandarê Herêma Çarêmin a Eyaleta Mêrdînê ye). Bi dîtina wî de me agahdariyên firehtir ji heval İsmail bîstana. Me jî got tamam. Lê dîsa jî, sohbetê di navbera me de derbas bû hêjayê weşandinê ye. Bi rêdana wî em vê sohbetê bi kurtahî diweşînin.

Ji bo dîtina gerilayan, bi şev em ketin rê, piştî çend saetên din em gihîştin ciyê hevdişînê. Ew çend roj bû em li benda vê hevdişînê bûn, ji ber vê yekê dema em gihîştin ciyê hevdişînê min çavê xwe li nav menzelê gerand, lê ji min re gotin ku divê em hinek rûnin, piştî demêke kurt wê gerîla werin. Di ser re hezrê deh deqîqê derbas bûn, deng ji pencerê hat, îşaret dan û ji hundir jî cewab standin û ketin hundir. Berpirsiyarê wan Hesen bû. Giş çar gerîla ketin hundir, me kêfxweşî li hev da û hezrê sê saet em şitexilîn. Berpirsiyarê wan Hesen, hevalekî beşer vekirî, bejin dirêj û ciwan bû. Bi dengê nîzîm û hêdî hêdî dişitexilî, pîrr aram û bi sebir xuya dikir. Pêşî gazinên xwe ji me kirin. Li gor hevalê Hesen, rojnameyên me zêde li ser gerîla nasekinin. Ji deh livbaziyan (eyleman) yek an dudo tînin nivîsandin. Hêviya wan ew bû ku, hemû livbazi

û êrişên wan di Welat, û Yeni Ülke de bînin nivîsandin. Heval Hesen li ser vê yekê ev tişt gotin: "Heval, em rojnameya Welat hejmar bi hejmar ji serî heta binî dixwînin, bi rastî em wê pîrr dicivînin, hem ziman, çand û nîrxên gelê me ji windabûnê xelas dike, hem jî gelê me ji têkoşinê haydar dike. Lê dîsa jî zêde li ser livbaziyan me nasekine. Mesela, di van mehên dawî de me du car qereqola Xirbekûr tahrîp kir û ev qereqol jî holê rabû. Radara Bêkendê hate şewitandin. Du xayînen ku ji şêhidkirina heft gerilayan mesûl bûn, li Cesana hatin cezakirin û hwd. Lê ew bûyer ne di Welat de, ne jî di Yeni Ülke de nehatin nivîsandin."

Li gor heval Hesen ku gelê me pariyek şiyar be û helwestkar (duyarî) be, tu şansê dijmin tune di vî şerî de. Hesen li ser vê yekê gotina xwe wiha domand: "Di şer de baweriya xweparastinê tiştêk nayê bîra wan. Di kemînen ku li pêşîya me vedikin de jî ew bi xwe jî tîrsa û ji bêbaweriyê direcîfin, şaş dibin û zaiyatên mezin didin. Em carnan li bêtêlê (têlsizê) guhdarî dikin, di bêtêlê de jî, ji perç û xwarinê pêştir behsa tiştêkî din nakin. Yanê haya wan ji xwarin, perç û xweparastinê pêştir ji tiştêkî din tune. Ev jî, bêbaweriya wan êşkere dike û têkçûna wan nêzik dike."

Heval Hesen rewşa Misircê ne xerab didît, lê dîsa jî gazinên wî ji gel hebûn. "Erê gelê vê herême zêde ne xerab e, lê zêde tîral û sersar e, wezîfeyên xwe bi temamî naynin cih. Gelek çêşîdên xayîntiyê hene, dema tiştêkî ji we (ji aliyê Partiyê ve) bê xwestin û hûn pêk neyînin hingê hûn dikevin rewşa xayînan. Demekê, ku yekî îxbara yekî din nekira û zerar neda kesekî din, jê re digotin durust û rast, lê îro reng û maneya durustiyê guheriye. Ji bo ku mirov dikaribe ji yekî(ê) re bibêje durust lazim e wezîfa ku dikeve ser milê wî(ê) pêk bîne. Ên wezîfa xwe ya welatparêziyê di ser guhê xwe re bavêje, bi awayekî, xayîntiyê dike."



Îsal' emê giraniya xwe bidin ser jî-holêrakirina xayînan. Xayînen ku sûcê wan werin tesbîtkirin, wê bînin cezakirin.

Heta niha ku xayînan jî cerdevan dihatin kuştin hevalan pere dixistin devê wan, lê ji niha û pê ve di şûna pereyan de emê rêx û pisîtiyê bixin devê wan, da ku werê zanîn ku ew ker in û di riya kerîtiyê de diçin."

Bangeke heval Hesen ji bo gelê Kurd huye: "Me ambargo daniye ser Şêxên Zoqeydê. Lazim e tu kes bi wan re nekeve têkiliyê. Heta Şêx têkiliyên xwe ji dijmin nebînin û xwe rexne nekînin û xwe nespêrin Partiyê, divê tu kes bi wan re xeber nede û nekeve têkiliyê."

Di van mehên dawî de, bi taybetê li herêma Xerzan gerîla otobus û erebeyan disekinînin û nasnameyê xelkê dicivînin. Min sebaba komkirina nasnameyan ji Hesen pirsî, wî wiha şîrove kir: "Ji ber nepejirandina (neqebûlkirina) TC'ê ye. Bi vê komkirinê, em gelê xwe ji nasnameya TC'ê xelas dikin û rê ji wan re vedikin ku tevî hareketa bibin. Li aliyê din ev bangeke ji raya giştî ya dinyayê re."

Li gor heval Hesen li Kurdistanê, ji niha pê ve her sûc wê bê cezakirin. "Dema yek yekî bikuje, ku yê hatiye kuştin ne xayînan be, emê jî wî yê din bikujin. Em heyfa elok û mirîşkêkê jî li erdê nahêlin." Heval Hesen li vê derê bûyerê komîk û balkêş jî me re anî ziman: "Mesela wê çendeyê, yekî pênc elokên dik dizîn. Hevalan pêncî elokên dik ceza danin ser wî yê diz. Ku ew elok giş ne dik bin jî heval qebûl nakin."

Dawî, ji bo rojnameya Welat Hesen û hevalên wî dîtînen xwe wiha anî ziman: "Nivîsên Apê Musa pîrr li xweşê me dihatin. Em zêde girîngiyê didin rojnameya Welat. Nexasim jî bo hevalên ku bi Tirkî nizanin Welat rojnameyêke pîrr pîrr hêja ye."

Bahoz Rojava

HAWAR

Dilbixwîn

Destpêka dawiyê

"Dema min xatirê xwe yê dawiyê ji we xwest, jî bîr nekî divê hûn kulmek ax ji ser gora Firazê min bînin, wê axê tîxin nava kefenê min û bi cendekê min re veşêrin. Ji we rica dikim, hûnê wê axê bi ser dilê min de bireşînin. Ez dixwazim careke din lawê xwe bibînim, pê re şa bibim. Dixwazim vê carê tivingekê li ser daxwaza wî jê re bikirim. Dixwazim bi destê xwe şûtika wî girê bidim, rextan li ser piştê wî bişidînim....Ez dixwazim bi xwe wî bigihînim ser sînor û gotina dawiyê jê re bibêjim: "Ez westabûna xwe ya 24 salan li tehelal dikim. Xwe biparêzin, zû şehîd nekivin, her tişt bi mirinê naqede, mirin gelekî hêsan e. Eger lê rast hat hûn birîndar bûn jî, bila devê birînê di sînga we de be, piştê xwe nedin wan bêbavan..... Belê hevalno, ez dixwazim li ser sînor bi ser bejna delalê xwe de bilînim..."

Dilê dayîka heval Firaz ev gotin digotin, lê mixabin ziman nedigeriya ku vê wêneya çeleng şanî me bide.

Du sal di ser hevpeyvîna me re derbas bûne. Hêdî hêdî ji me re li ser şehîd Firaz diaxîfî

û bîranînen bi wî re dihanî ziman. Hin caran girî û hin caran jî ken. Lê her demê, serê xwe bi şehîdbûna Firaz bilind dikir. Di wê kêliyê de ji xwe dipirsî: "Gelo wê çawa pênuş bikaribe hestên diya Firaz şîrove bike?" Ez gelekî li bersiva vê pirsê geriyam, piştî du salan li rastiyeke rast tîm ku, divê mirov wateya şehadetê ya rastîni şîrove bike.

Dixwaze her tiştî jî me re bibêje, lê nikare. Dixwaze di wê kêliyê de rêveçûna 20 salan bîne ber çavan, ji bo wê şîrovekirinê eger hate xwestin bibe hozan, bibe dîrokzan û ji me re dîroka jiyana kurê xwe bibêje. Bibe dengbêj û ji me re dîrok û lorîkan bibêje. Dixwest bibe her tiştî û ji me re her tiştî li ser mîranî, dilêrî, gernasî û serbilindiya kurê xwe bibêje....Lê cihê dax û mixabinê ye ku dil bê ziman e.

Em li benda wê kêliyê ne ku destpêk û dawî xwe tê de bigihînine hev. Lê, em bi hêviya destpêkê jiyana dibin.

Em bi vê jiyana xwe re, dawîya dawiyê tinî û bi destpêka destpêkê dest pê dikin.

Felsefeya jiyane vê ji me dixwaze. Bi felsefeya dijmin, êdî em nikarin jiyana bibin. Bi ava dijmin gula me dikare bişikve? Diçilmise, êdî gewdeyê me wê giyana bê jiyana napejirîne.

Ji lew re em di bin zincîr û tekerê tanqan de tîne perçiqandin. Em di bin dîwarên berfê de dimînin û bi xwîna xwe gula welatê xwe vedijînin.

Ji lew re em di nava dîwarên zindanan de li hemberê hemû zagonên hovane yê ku sînor mirovahiyê diqetînin, li ber xwe didin. Ji bo vê armancê em xwe bi çiyana re dikine yek û ji dîroka serfiraziyê re tîpan rêz dikin.

Divê destpêk û dawî xwe di xalekê di bigihînin hev. Dema ku destpêk dawîya dawiyê bîne em hingê dikarin bibin xwediyê welatekî serbixwe û azad. Wê demê jiyana, nû dest bi jiyana xwe dike.

Em bi destpêka dawiyê serfiraz dibin, serfirazî bê serxwebûn nabe. Lê heya ku em dawiyê bi destpêkeke serkevî neperçiqînin, em nikarin bibin xwediyê serxwebûnê, ji lew re emê bi hêviya hatina wê kêliyê jiyana bibin.

Felsefeya jiyane ye, jiyana bê felsefe nabe. Em jiyana xwe di vê felsefeyê de dibînin. Em jiyane bi kuştina mirinê dest pê dikin. Kuştina hemû tiştên kevin, hemû taybetî û xisletên ku me bi kevin ve girê didin....

Ji bo ku baş were tîgihîştin, em li benda dawîya bindestiyê û destpêka serxwebûnê ne. Di vê kêliyê de destpêk û dawî xwe digihînine hev û dara azadiyê meyweyan dide.



Agahiyên rojnameyan ne rast in

Astrîd Kjetso

Der barê Kurdistanê de zanîn û agah hê li Unîversîteyên Norwecê neketine radeyeke fermî. Yanê li enstîtuyan wek beşên lêkolînê. Lê car din jî di vî warî de min xwe êşandiyê û kiriyê xwedî agahan. Înterensa min jî bo dîrok û politikayên Kurdan ev zêde kir. Ji ber vê yekê ye ku, di van şeş salên dawî de ez bi awayekî giranbuha sê rojnameyên Ewrûpa, ku der barê pirsgrêka Kurdan de xwedî agahiyên herî mezin in, dixwînim û dinirxînim. Li Tirkîyê *Le Monde*, *The Independent* û *Neue Zuercher Zeitung* û pîrr caran Kurdistanê ziyaret dikin. Ew her-sê rojname her çax (herwest) der barê vê herêmê de raporên çêdikin û dişînin.

Ji wan rojnameyan tu yekî jî -weke rojnameya *Aftenposten* (Norwec), *Adresseavisen* (Norwec) û *Jyllands-Posten* (Danîmarqê), *Per Nyholm*, bi awayekê vebirî (kesîn) Partiya Karakerên Kurdistanê PKK, weke "terorîst" nedîtîye. Li gor lêkolînên min di nav rojnameyên Skandînavyayê yên cidî de bi tenê ev her sê rojname vê gotinê bi kar tînin.

Weke ku tê zanîn di nav "terorîst" û "şervanên azadiyê" de rîyeke kurt (kin) heye. Ew jî girêdayê ew çavên ku lê çawa dinêrin e. Herdu nişan jî pîrr subjektîv in. Rojnameyên Ewrûpa û Skandînavyayê "gerîla", "veqetînxwaz (ayrîlikçi)", "asî" û



Rojname, lêkoşîna gelê Kurdistanê wek "terorîzm" didin xuyakirin.

hwd. bi kar tînin. Xwendevanên ku der barê nakokiyê Kurd-Tirkan de xwediyê agahiyên e, dizanin ku heger mirov ji PKK'ê re bibêje terorîst, ev tê vê maneyê ku mirov ew zimanê fermî, ku dewleta Tirkîyê bi kar tîne, dipejirîne.

Ajans û rojnameyên Tirkan mecbûr (dewleta Tirk dewleteke otorîter e. Hêz jî bo wê her tişt e) in vî bi kar binin. Ji ber vê yekê ye ku, mirov nikare bawerîya xwe bi wan bîne û bi pîrranî jî der barê PKK'ê de. Dema mirov medyayên Tirkan taqîb dike, dibîne ku ew di vî warî de tu caran agahiyên rastî nadin (ev agahiyên ne rast jî gelek caran dikevin a-

jansên Rojavayê). Ev rewşa han her roj xirabtir dibe. Rojnameyê Tirkan ê herî cidî û xwedî qalîteyê Cumhuriyet, niha di destê kesên ku pîrr nijadperest "Tirkên Ciwan" in, de ye.

Ev mînak pîrr bi cih e: Dema serokkomarê Tirkan û hemû medyayê Tirkan Kohl wek Hitler dîtî, dan xuyakirin ku ev zimanê fermî, ku Tirk bi kar tînin, çiqas jî realite û rastiyan dût û bê bingehe e (ew derew jî aliyê hemû dinyayê ve tê kontrolkirin).

Xwediyê vê nivîsarê bi xwe di karvaniyê de rastî sosretiyên medyaya Tirkan hatiye. Ev mînaka ku ez li vê derê didim, ronahî dike ku medyaya Tirkan di rasti-

ya xwe de çawa dixebitin û bi çi qeydê dixwazin medyaya Rojavayê bixapînin. "Di nêzik de ez bi xwe li herêma Diyarbekirê bûm. Li wê derê leşkerên Tirkan êrîş birin ser sê komên (grûbên) Kurdan ên sivil.

Leşkeran raste rast gulle reşandin ser girseyê gel û ji wan 16 kes kuştin, bi sedan jî kes birîndar kirin. Êrîş di medyayên Tirkan de bi awayekî hat parastin û şiklê wê hat guhertin ku mirov digot ev êrîşa han di zemanekî gelekî kevn de pêk hatiye. Lê, du (2) êrîşên Kurdan, ku bersivên ew êrîşên Tirkan bûn, di medyayê de şiklekî din girti bû. Êrîş weke êrîşeke kûvî, bêînsaf û

Kurd jî weke "heywanên hov (wahşî)" dihatin temsîlkirin. Kesekî nedipirsiya gelo çima Kurdan dixwestin bersiva xwe bidin?

Dem a ez vegeyîyam mal, min jî rojnameyên Ewrûpayê nivîsarên li ser van bûyeran berhev kirin. Bi tenê nîrxandina *Neue Zuercher Zeitung* nêzî rastiyan ew bûyeran, ên ku di ber çavên min de pêk hatibûn, bû.

Heger *Adresseavisen* dixwaze der barê PKK'ê de bikaranîna gotina "terorîstan" bidome, divê mirov wilo fêhm bike ku rojname raste rast di nakokiya Kurd û Tirkan de li dijî Kurdan alîkariya dewleta Tirkan dike û zimanê propagandayê ya rêvebirên dewletê bi kar tîne.

An Rojava (Xerb) an jî ez, em jê hez bikin an na, PKK di polîtîkaya Kurdan de bûye xwedî hêzeke bi bîr û bawerî. Ji nivîzêdetir Kurdên Tirkîyê piştigiriya PKK'ê dikin. Û ew, îro jî salên 70'yî pîrr û pîrr zêdetir hevûdu digirin û li hev xwedî derdikevin.

Helsinki Watch di raporeke xwe ya havîna 1990'î de da diyarkirin ku, li pîrraniya herêmên Kurdistana Bakur jî aliyê rûniştvanan ve piştigiriya PKK'ê gihîştîye ji sedî 70-95'an, û li herêmê din jî piştigirî ev salên dayî zêdetir bûye.

Ez bawer dikim ku rojnamevanên *Adresseavisen* û yên din dizanin ku Kurdistana Bakur bi zagonên (qanûnên) awarteyê tê birêvebirin (îdarekirin). Jixwe jî ev 70'ê salên dawî 58 sal Kurdistan bi hoyên (şertên) awarteyî hatiye îdarekirin. "Zagonê antî terorê" ku dewleta Tirk niha li Kurdistanê bikar tîne, nevekirî ye. Li gor vê zagonê; yên ku dewletê rexne dikin (rexne çawa dibin bila bibin), giş dikarin bi çavên "terorîstan" bînin dîtî û dirhkirin (demxekirin).

Tirkîye li gor xwe qaîdeyên tîgînên "demokrasi", "dewleta hiqûq" û "terorîst" bi cih tîne, ku tu dewleteke Rojavayê jî nedixwest û nedikaribû qebûl bike. Em tîgînên ku me li vir bi nav kirine li Rojavayê xwedî pozîtîv û negatîv sazî (kurum) ne. Enqere jî dixwaze wan saziyan li gor xwe bi kar bîne û bi nezaniya Rojavayê (Xerbê) jî, wan bixapîne.

Ez hêvî dikim ji vê pê ve *Adresseavisen* û rojnameyên din nûçeyên li ser pirsgrêka Kurdan bi dorfirehî bikolinin û zimanekî bê teref (noytral) bi kar binin.

Nivîsara jêrin li rojnameya Norwecê, *Adresseavisen*, bi navê Astrîd Kjesto derket. Nivîskarê gotarê zimanzan e û li Unîversîteya Osloyê wek mamosteyê zimanê dixebitê. Gotara wê bersiva rojnamevanekî Danîmarqî, *Per Nyholm*, ku rojnamevanê rojnameyê *Jyllands-Posten* a û jî bo *Adresseavisen* jî dinivîse, ye.

GOTIN

Yaşar Kaya



Musa Anter li Zûrîchê

I ro çend roj e ez li Şûlsê me. Du şev berê civînek hebû. Ev civîn li ser mamosteyê delal kekê Musa Anter bû. Ez û Ragîp Zarakolu hem mêvan bûn, hem jî xwediyê axaftinê bûn. Civîn li ser jiyana Musa Anter hatibû amadekirin. Hevalên Alman, gazî Zozan Bûcak jî kiribûn. Cihê civîne saloneke mezin bû.

Xwişka Zozan, li ser hevaltiya bavê xwe Faîk Bûcakê gorbuhuşt û Musa Anter axaftineke delal kir. Li ser hevaltiya wan, gelek bîranînên delal anî ser zarê xwe. Lê bi vê jî nesekinî. Kekê Musa li ku û çawa nas kiriyê yek bi yek got. Bi meseleya Kurd û Kurdistanê axaftina xwe domand.

Dor hate ser min. Min jî bo kekê Musa çend rûpel nivîsibû. Tê de ji rojna-

mevaniya wî ta zîmanzaniya wî gelek tişt hebûn. Min qala dîrokzaniya wî û jiyana wî ya delal jî kir. Li ser nivîskariya wî ya li Gündemê, li Yeni Ülke, li Welat, li ser şoreşvaniya wî, li ser jiyana wî gelek tişt gotin. Kurd û gelê Swîsre, salona dêrê tijî kiribûn. Piştî axaftinên me nivîskarekî Swîs jî çend gotin got. Ev civîn, piştî civîneke jî bo çapemeniyê pêk hat. Gelek rojnamevan, bi dilguhên xwe dane axaftinên panelîstan.

Dihate bîra kê. Çend sal berê kê bawer dikir ku dê li Zûrîchê ronakbîrên Kurd, rojnamevan, filîmger bêne cem

Nav û dengê wî, li welat, di nav gel de gelek belav bûbû. Lê min di vê gera xwe de dît ku nav û dengê wî li welatên biyanî jî gelek belav bûye. Herkes bi têkoşîna wî ya ku ji bo Kurd û Kurdistanê dida zane.

hev û jî bo Kekê Musa civînekê çêkin û li ser jiyana wî, nav û dengê wî, kuştina wî giî û gaziyan xwe bibêjin.

Lê her diçe dinya biçûk dibe, guhên

Ewrûpa û welatên din li ser Kurdan e. Çi li Kurdistanê bibe, haya wan jê heye.

Li ser Kekê Musa çend hevalên din jî bîranînê xwe anîn ziman. Wan jî digot: "Nivîskarekî mezin bû. Dîroka Kurdan bû. Zîmanê Kurdî baş dizanibû. Ferhengeke Kurdî çêkiribû. Li tu welatî mirovên wiha nayên kuştin. Kuştina Anter bi destê dewletê ye. Ew mirovekî demokrat bû, şer nedixwest. Li gorî wî Kurd û Tirk bira bûn, wî biratiya herdu gelan dixwest. Dewletê Musa Anter kuşt. Em wiha dibînin."

Nav û dengê wî, li welat, di nav gel de gelek belav bûbû. Lê min di vê gera xwe de dît ku nav û dengê wî li welatên biyanî jî gelek belav bûye. Herkes bi têkoşîna wî ya ku ji bo Kurd û Kurdistanê dida zane.

Jîneke Alman Marîanna, ji bo Kekê Musa û li ser jiyana wî axaftineke xweş kir. Te digot qey, ev çend jin û mêr ên di salonê de giş heval û hogirê wî ne. Xuya ye, di nav biyaniyan de jî, dê navê Kekê Musa mezin bibe û bijî. Di nav guhdaran de, jî Bîngolê ta Mêrdînê, Qersê, Heymanayê, Diyarbekirê, Xînisê, Erzeromê Kurd hebûn. Gişan bi hev re û bi yek dilekî digotin:

"Apê Musa namire, Wê Apê Musa tim bijî".

Polîs buroya me îşxal kir

Van rojên dawî zilm û pesta ku dewlet li gund û bajarên Kurdistanê dimeşîne, bi awayekî eşkere xwe gihîştandê Stenbolê. Vê hefteya dawî gelek rojnamevan, weşankar û hunermendên welatparêz hatin girtin; hin ji wan hatin berdan, ên din hîna di nezaretxane û îşkencexaneyan de ne. Zehfên wan kesan bi awayên hovane, li derve, bêyî rêdana fermî (izna resmî) hatin girtin û avêtin nezaretxaneyan. Ev girtin, roja sêşemê dest pê kirin.

GIRTIYÊN KEYFÎ

Ji rojnameya me, berpîrsi-

yarê me yê nivîsaran, li derve bi kotek û bi awayekî hovane pêşiya wî, ji aliyê çar polisên sîvil ve tê girtin. Dema polis dikevin milê wî ku bi darê zorê wî bixin minûbusa xwe, ew jî qîrevîr dike û hawar dike: "Ez rojnamevan im, navê min Mazhar Günbat, bi kotek ev polis min dibin, xeber bidin rojnameyan." Li ser vê yekê kesên dengê wî dibihîzin rojnameyan jê haydar dikin. Piştî deh deqîqeyên din, ji rojnameya Yenî Ülke Seval Şabanoglu, Muslum Yücel û Ümran Kalayci li eynê minûbusê siwar dikin û dibin qereqolê, dora rojê wan ber didin.

Li aliyê din ji weşanxaneyê Melsa, Berpîrsiyarê wê Adnan Alp û Şükrü Piliç tene girtin. Ji kovara Özgür Halk jî Hasan Tepe, Murat Yalçın, Yeliz Şener Haydar Demîr hatin girtin û berdan. Ji MKM'ê Salih Dünder, Celal Şekeroglu, Saniye Aktaş, Esmâ Eksen, Kemal Şahin, Mahmut Fakhani û Haydar... hîna di bin çav de ne.

ÊRÎŞÊN HOVANE

Ji xeynî van girtinan, polisên ji şubeya li dijî terore girtin ser rojnameya me, rojnameya Yenî Ülke, kovara

Özgür Halk, Weşanxaneyê Melsa û MKM'ê. Li van sazî û rojnameyan polisên dest danin ser arşiv, pirtûk, klavye û eşyayên metbexa Özgür Halk'ê.

Wekî din, roja çarşemê nêzîkî 20 polisên sîvil tevî sîlahên otomatîk girtin ser rojnameya me û Yenî Ülke. Bi xwe re Berpîrsiyarê Melsa Adnan Alp jî anîbûn. Adnan Alp nikaribû xwe li piya bigirta, hewçend lê îşkence kiribûn. Li ba me jî lê dixistin û jê tiştan dipirsîn. Arşiva me û ya Yenî Ülke serobino kirin, li nasnameyên me nihêrtin û piştî saetêke din lê dan çûn.

Wisa xuya dike, ev girtin û êrîşên keyfî bi mebesta çavtirsandina welatparêzan tene kirin.

Li hember vê hovîtiya ku dewleta Tirk li dijî welatparêz û rewşenbîran dimeşîne, çapemeniya Tirk bêdeng ma û xwe kerr kir.

PROTESTOYA REN'Ê

Rêxistina Efû ya Navneteweyî ya Londonê, li ser girtin û êrîşên polisên TC'ê li rojnameya me geriya û agahdarî stand û belavokeke protestokirina TC'ê ji çapemeniyê re şand, û piştîgirîya xwe ji bo me anî ziman.

Kuşîna 5 kesan li ser MIT'ê ma

Navenda Nûçeyan- Di 27'ê Gulana 1992 'an de, 5 kes li ser riya Mûş-Gumgumê (Varto) ji alî cendirmeyan ve di erebeyêke sîvil de tene girtin. Dû re van 5 kesan dibin qereqolê. Piştî vê bi demekê, ji MIT'ê 7 kes tene dibêjin: "Em ji îstixbaratê ne. Pîrsiyariya van kesan emê bikin." Û 5 kesan bi xwe re dibin. Ev mirovên sîvil tevî 5 girtiyan tene ser Pira Muradê û li vir dest bi îşkenceya girtiyan dikin. Lê nikarin tu tiştî ji devê wan 5 kesan bigirin. Dû re destê van 5

kesan datînin ser serê wan û dibin binê pirê. Li vir, xwelî dikin nav kaxetan û bi vî awayî dixin devê wan. Her yek, li pişt girtiyeke disekine û yê girtî li ser çokan dadixin erdê, di dema çeyra her yekî ji wan de 14-15 gule hene û hemû guleyên xwe di partîkên (paşîya stûyê) wan de diteqînin.

Ev bûyera jorîn, tevî hemû beyan û giliyên malbatên kuştîyan û serlêdanên Mebûsê HEP'ê yê Mûşê Sirri Sakik, hate nixumandin û der mafê qatilan de tu tişt

nehat kirin.

Dozgerê (savci) Mûşê Nail Yalçın, hê di wê demê de, li ser van cîneyetan disekine û dixwaze der mafê failan de dawê veke. Lê li gor qanûnên Tirkiye ji bo mehkemekirina endamên MIT'ê, destûra hikûmetê lazim e. Li ser vê, dozger nameyek ji wezîrê edaletê re dişîne û destûra dawevêkirinê dixwaze. Lê destûreke wiha ji wezaretê nayê. Hinceta wan, nekîfşûna navên endamên MIT'ê bû. Li gorî wan, ji ber ku navê failan nehatiye

kîfşîkirin, dawê venabe. Li ser vê, dozger dev ji vê dawê berdide. Kovara hefteyî "Aktuel", di hejmarê xwe ya 84/11-17 Sibata 1993 dawî de, bi awayekî fireh li ser vê meseleyê sekiniye û bi şahid, malbat û berpîrsiyaran re xeber daye. Ev bûyer, ji ber ku ev cara yekemîn e, bi îsbat û şahid di kovarekê de tê weşandin girîng e. Nexwe, bi sedan bûyerên wiha çêbûne û bi sedan mirov bi vî rengî hatine kuştin.

Wezîrê Edaletê Seyfî Oktay, ji bo ronîkirina vê mese-



Sirri Sakik

leyê û girtina failan soz daye nûçeyanê Aktuelê. Lê tê zanîn ku sebeb û failên van bûyeran hikûmet bi xwe ye û sozên wiha gelek caran hatine dayîn, lê tu tişt nehatiye kirin.

Rojeva 3 dagirkeran: Tunekirina Kurdan

Tirkiye, Sûriye û Îran, ji nû ve li ser pîrsîrêka Kurdî li hev kom bûn û biryarên hevkarîyên nû girtin. Ji her sê welatan, wezîrên karên derve di 9'ê Sibata 1993'yan de li Şamê civinek pêk anîn û di dawîya civînê de, beyan kirin ku her sê dewlet jî, li hember parçebûna Iraqê ne.

Xuya ye ku li Başûrê Kurdistanê îlankirina dewleteke federe û avakirina meclîsê, di nav her sê we-

latên dagirker de astengiyên girîng derxistiye. Di rastiya xwe de, her çar welatên dagirkerên Kurdistanê, li ser pîrsîrêka Kurdî tu pêşveçûnên siyasî napejirînin û li hember van pêşveçûnan di her rewşê de, bi hev re danûstandinên xwe didominin.

Ev civîna dawî jî, bi beyaneke wiha xelas bû û her sê welat li dijî çareserkirina pîrsa Kurdî qewl û bextên xwe careke din kirin yek.

Kontrayan nûçeyanê Gündemê revandin

Nûçeyanê rojnameya Özgür Gündemê "ku ji bo demekê navberdaye weşana xwe" Akîf Şenyîgît di 8.2.1993'an de li Amedê dema ku ji Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) vedigere ji hêla "kontragerîla" ve hat revandin.

Kesên ku nûçeyanê Arîf Şenyîgît dirêvînin dixwazin hin tiştan jê hîn bibin û bi gef û gurran bi ser ve diçin da ku agahiyên dixwazî hîn bibin jê bistînin. Piştî mirad bi daxwaziyên xwe nakin wî berdidin. Nûçeyanê Şenyîgît, serpêhatiyên xwe wiha anî zimên: "Ez ji bo danişînê bişopînim çûbûm DED (DGM) ê. Polisên devê derî ez hilnedam hundirê dadgehê. Me bi hev re muneqeşe kirin. Piştî ku ez ji wir zivirîm û weşek meşiyam, çar kesên

çekdar ji paş ve ez dam sekinandin û bi zorê ez li erebeyêke Renault siwar kirim.

Di destên wan de çekên G 3 hebûn.

Çavên min girê dan û ez birim cihêkî dût.

Li wir gulle berî nav ranên min û der û dora min dan, ez ditirsandim.

Ji min kesên ku li Amedê jî bo

Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê kî hatine

hîlbijartin û der barê hevalên ku li rojnameyê

dixebitîn, pîrsîn. Wan ez bi mirîne

tehdît kirim. Bala xwe dan ku ez

tiştêkî nizanîm û nabêjim,

ji nû ve çavên min girê dan

û ez berdam.

Lê ji min re gotin:

"Em dê hev bibînin!"

Mebûsên HEP'ê vegeriyan

Serokê Partiya Keda Gel (HEP) Ahmet Türk, li ser gera heyeta HEP'ê ya başûrê Kurdistanê, beyanek çapemeniyê weşand.

Di roja 2'yê Sibata de, ji HEP'ê Ahmet Türk, Mahmut Kilinç, Ahmet Karataş, Zübeyir Aydar, Ali Yiğit, Mehmet Sincar û Serokê Beledîya Diyarbekir yê Kevin Mehdi Zana, bi vexwendina Meclîsa Federe ya Kurdistanê Başûrê serdana nek fermî pêk anîbûn.

Ahmet Türk, di beyana xwe de, bi giştî qala serdana heyetê û so-

pinên xwe dike. Ahmet Türk Ambargoya Neteweyên Yekbûyî ya li ser Iraqê rexne dike û diyar dike ku, ev ambargo bi pirranî li ser Kurdan tesîrê dike. Rexneyên Ahmet Türk ji Tirkiyê re jî hene, lewre li gor Ahmet Türk dewlet di deriyên gumrikê de, nahêle qamiyon bi hêsani derbas bibin û ji yê biyanî jî gumrikên zêde tene standin.

Ahmet Türk, bala raya giştî dikeşîne ser bêqûtî û birçîbûna gelê başûr û daxwaza rakirina ambargoyê dike.

Îsmail Beşikçi dozger derewîn derxist

Hemû daweyên ku li ser nivîs û pirtûkên Îsmail Beşikçi hatine vekirin, di mehkemeyekê de hatin civandin û mîna yek daweyek tene meşandin. Roja 9 Sibata 1993'an de, Îsmail Beşikçi rastiyeke dîrokî derxiste holê û dozger (savci) derewîn derxist. Lewre dozger îdianameya xwe li ser bingeha "Kurd tune ne" amade kiribû vê îdia xwe jî bi nivîskarekî Alman ve girêdide. Nivîskarekî Alman! Dr. Fritz, di pirtûka xwe ya

"Dîroka Kurdan" de, li dût îspatkirina tunebûna Kurdan digere û li gorî wî zimaneke Kurdî tune ye.

Îsmail Beşikçi di bersiva xwe de, îspat kir ku nivîskarek Alman bi navê Fritz tune ye û yê ku bi vî navî pirtûkê nivîsiye Tirkek bi navê Habil Adem e.

Mehkemeya Beşikçi didome û Beşikçi di hemû mehkemeyên xwede, dîtînen fermî mehkûm dike.

Hevpeyvînek bi dîrokzan û etnografa Kurd, Lamara Farê Paşayêva re - 3



'Şerê Bakur rizgarî û vegera me ye'

R.C.: Xwişka Lamara, em we weke miroveke polîtîk jî nas dikin. Em dizanin ku hûn di serokatiya Komela Kurdên Gurcîstanê (Ronahî) de jî, cih digirin, lewma em dixwazin hûn hinekî li ser rewşa Kurdên Gurcîstanê rawestin. Kengê hatine? Çawa hatine? Niha çi dikin? Problemên wan çi ne?

L.F.P.: Pareka ji Kurdên musulman hîna di sedsala 16'an de hatibûn li başûrê Gurcîstanê bi cih û war bibûn. Niha di Gurcîstanê de 33 hezar Kurd hene, ji wana 30 hezar li bajarê Tibîlîsê rûdin û sê hezar jî li bajarê Rustavî, Batomî û Têlavî ye. Kurdên Gurcîstanê tev bi dinê xwe ve Yezîdî ne.

Di dawîya sedsala 18'an û destpêka sedsala 19'an de, bireke Kurdan ku ji ber û qebilên mîna Ismaîla, Ce-

lalî, Receba, Broka û Rêtkâ hatine Gurcîstanê.

Piştî şerê Roma Reş û Rûsyayê (1828-29), Gurcîstan bi tevayî kete bin destê Rûsyayê û wî çaxî pîr hindik Kurd derbasî Acarîstanê bûn û li nêzikî Batomî bi cih bûn.

Di destpêka sedsala 20'î de li Axalkalakê û Axalsixa heft gundên Kurdan hebûne. Li aliyê Batomî jî weke 900 Kurdên Zaza diman. Di salên 1937'an û 1944'an de, hemû Kurdên musulman ên li başûrê Gurcîstanê-Acarîstanê diman, ji hêla dewletê ve koçberî Asiya Navîn, komarên Kazakîstan û Qirgîzîstanê kirin.

Kurdên niha li Tibîlîsê ne, piştî Şerê Cihanê ye Yekemîn di navbera salên 1918-1920'an de hatine vir. Tev Kurdên Yezîdî ne û ji aliyên Wanê, Karsê û Sur-

meliyê ne. Wê çaxê Gurcîstan serbixwe bû. Hikûmeta Gurcîstanê bi resmî izin daye ku Kurd li Gurcîstanê bijîn. Halê Kurdan pêşî gelek xerab bû, bê war û bê cih bûn, ji xwe re holik çêdikirin. Lê hêdî hêdî halê wan xweş bû.

Sala 1926'an li bajarê Tibîlîsê sê dibistanên Kurdî hebûn. Di van dibistanan de xwendin bi tîpên Latînî bû. Sala 1937'an hemû dibistanên miletên biçûk yê Cihû (Yahudî), Asûrî, Hurîm û yê Kurdan jî, ji aliyê dewletê ve hatin girtin. Alfabe Kurdî jî piştî wê demê derbasî ser tîpên Kirîlî kirin.

Kurd li Tibîlîsê mirovên karker in, di karxanan de dixebitin, şofêrên texsiyan in û koçeyan paqij dikin. Vê dawiyê xwendevanên me pîr bûne û kategoriyeke rewşenbîran jî peyda bû-

ye. Di nava me de helbestvan (şair), wênekêş (resam), tiyatroyan, joralist û hwd hene. Kurdnas û dersdar (mamoste) ên me gelekî kêr in. Xortên me zimanê Kurdî xerab dizanin. Rojname û kovarên me nîn in. Radyoya Kurdî tenê her heftê 15 deqeyan xeber dide. Problemên me gelek in.

Li Gurcîstanê weke li tevahiya Sovyetê prosesa (qonaxa) demokratiyê pêşve diçe. Em hîna jî nû organîzasyonên xwe çêdikin. Niha Komeleya me bi navê Ronahî li kêleka Weqfa Rustavêlî hatiye registrasyonkirin. Endamên me sê hezar in. Em dixwazin problemên Kurdistanê baş fêhm bikin û bi gelê xwe yê Kurdistanê re bibin yek. Nêr û meremên me yê qenciye jî bo karê miletê me pîr in.

R.C.: Hûn çawa li tevge-

ra Kurdistanê dinêrin? Hûn şerê serxwebûn û azadiyê çawa dibînin?

L.F.P.: Dilê me bi we re ye. Em şerê we, rizgarî û vegera xwe dibînin. Dilê me li ser şehîdan gelek dişewite. Bi dîplomasiyê welat bihata çekirin baş bû, lê em baş dizanin ku, bê têkoşîneke çekdarî ya xurt ev pîrs hal nabe. Dilê me bi şerê serxwebûn û azadiyê şa dibe.


"Sîstema Cihanê ya Nû" li stûyê miletan, dixwaze suwar bibe. Amerîka û Rûsya tenê berjewendiyên xwe diparêzin.

Kurd 30 milyon in, parçe-parçebûna wan bes e. Ji bona me jî mafê azadî û serxwebûnê heye. Gerîlayên PKK'ê riya hatina me vedikin. Em bi hemû derfetên xwe bi wan re ne. Ez ji hemû gerîlayan re schet û qewetê dixwazim. Bila riya wan vekirî be. Em dizanin wekî ew emrê xwe fedayê gel dikin. Xwedê me qurbana wan bike. Em dixwazin tiştê alî wan bikin. Bila lê bixin, baş lê bixin û heyfa me hilînin. Ez dixwazim di nava wan de bim. Gulleya li wan bikeve, bila li min bikeve. Qehremanên Kurdan ên rast ew gerîlan e, ku qet revê nizanin.

R.C.: Baş e, em zor spas dikin. Gotineka we ya din hebe, hûn dikarin kerem bikin.

L.F.P.: Ez silavên xwe li hemû gelê Kurdistanê dikim û ji Serokatiya gel re emrekî dirêj dixwazim. "Rast e em ne malekî ne, lê em halekî ne." Daxwaz û meremên me avakirina Kurdistanê serbixwe û azad e. Serkevtin û serfirazî ya me ye.

R.C.: Zor spas. Em bi dîtina we gelekî kêfxweş bûn.



5 îlon 1992, şeva piştigirtina PKK'ê li Rewanê (Ermenistan)



Miletê ku li milletên din zilmê dike
ne azad e.

Karl Marx

MÎT'a Demirel û MÎT'a Erbakan

Cîgirê Serokê Grûba Partiya Refahê Şevket Kazan, bi belgeyek ku ji MÎT'ê bi dest xistiye, bû sedemê gengeşiyên mezin û li ser vê meselê beyanên Demirel jî, du serîbûna MÎT'ê derxiste holê û rastiyên girîng û balkêş eşkere bûn.

Rapora ku Şevket Kazan li meclîsê xwend, ji kuştina Uğur Mumcu, CIA û MOSSAD'ê berpirsiyar digire. Rapor jî serokwezîr re hatiye birêkirin û li binê raporê îmzeya Mûştêşarê MÎT'ê Sönmez Köksal heye. Li gor vê raporê, CIA bi alîkariya MOSSAD'a Îsraîlê ve cîneyetê pêk aniyê. Tîma ku vê cîneyetê pêk aniyê, li Îsraîlê û ji alî rêxistina GADNA ve hatine perwerdekirin. Ev tîm hê jî, li Tirkîyê ye û rojnamevan M. Alî Birand jî hedefa wan bûye. Di raporê de, armanca van sûtikastan jî wiha tê diyarkirin: "CIA, bi van sûtikastan, ji bo planên xwe yên li ser Rojhilata Navîn, hêzên îslamî û Îranê weke talûkeyek dibîne. Ji ber vê yekê jî, ji bo raya giştî ya Tirkîyê û dewleta Tirk, li hember Îranê û hêzên Îslamî rabin, cîneyetên wiha pêk tîne û dixestûye Îranê."


Piştî ku ev rapor li meclîsê hate xwendin, tevlihevîyên mezin çêbûn. Bersiva



Süleyman Demirel

gelek pirsan li hewa ma û herkesî berê xwe da hikûmetê ku beyanek bide. Beyana Serokwezîr Süleyman Demirel, bersiva vî pirsê da û du serîbûna MÎT'ê eşkere bû.

Li gor beyana Demirel, ev rapor sexte ye û ji alî hînek kesên di MÎT'ê de hatiye amadekirin. Demirel, li ser pirsê rojnamevan wiha dibêje: "Nameyên bi vê celebê, car bi car ji min re jî dihatin. Min jî wan di da MÎT'ê. Dû re, rojekê serokê MÎT'ê hat cem min û ji min re got (Ev ji nav me derdikevin). "Ev kesên han dikarin pîr rind, îmzeya musteşar jî deynin bin nameyan." Demirel di axaftina xwe de, qala cîneyetên ku failên wan nayên girtin jî kir û wiha got: "Hin zaafên dewletê hene. Hin astengî li pêşîya me ne. Cîneyetên failî-meçhûl



Necmettin Erbakan

pirsgirêka Tirkîyê ya herî girîng e."

Li gor vê beyana Demirel diyar dibe ku, di nav MÎT'ê de, gelek hêz hene û her yek jî bo menfaetên rêxistin û bawerîya xwe kar dike.

Di rastiyê de, çendserîbûnên bi vî rengî, di hemû avahiyên dewletê de xuya dibin. Di nava polis de, di ordiyê de, di avahiyên perwerdekariyê de, bi kurtasî li her cihî, dubendiyên wiha hene. Hêzên îslamî, faşîst, kemalîst û liberal, dewletê li hev û din par kirine û her yek li gor dîtinên xwe qadroyan di sazîyên dewletê de, bi cih dikin.

MÎT'a Tirkîyê jî, bi vî rengî parve bûye û dê di rojên pêş de diyar bibe ku, ka MÎT'a Demirel an MÎT'a Erbakan serfiraz dibê.

Ev hezkirin ji ku tê?

Yalçın Küçük kerem dike: "Emîn Çölaşan yek ji wanê li Bab-î Alî ku herî bi namûs e." Biçûkê ve yekê jî ku derdixê û ji ku derê digihîje vî qerarî em nizanin. Tiştê em dizanin ne tenê li Bab-î Alî li Tirkîyê tev de kesekî jî Emîn Çölaşan, ji maneya ve gotinê dûrtir nîn e.

Devera ku "Mişkê Heram" lê bi namûs bê hesabkirin Xwedê evdê xwe jî wê derê dûr bixe. Mirovên wilo ne hêjane avê ku li destê bênamûsan bikin. Maneya namûsê jî kengî ve evqasî erzan bûye? Xwedê me biparêze!

Emin ÇÖLAŞAN


MEHMET ALİ'NİN APO'DAN RİCASI

S U bizim, "önce ajan sonra gazeteci" olan Mehmet Ali, valahi ömür adam! Çok yönlü bir arkadaş! Her tarakta bezi var. En kritik günlerde ekrana Osman Öcalan'ı çıkarıyor, Türk Silahlı Kuvvetleri PKK üzerine operasyon yaparken, onu programında konuşturup PKK'ya moral hocası görevini yerine getiriyor. Sonra Abdullah Öcalan'la yıllar önce yaptığı bir röportajı, sanki yeni bir olaymış gibi gazetesinde yayımlayıp bir reklam daha yapıyor. Büyük tepkiler alınca ekrana çıkıp "Vallahi beni yanlış anladınız. Ben bu vatanın bölünmezliğinden yanayım" gibi sözler söylüyor! Her konuda ah-kâm kesmeyi iyi biliyor da, cevap veremediği tek konu, Ankara'da devam eden davası!... Biliyorsunuz, devleti dolandırmak ve evrakta sahtecilik iddiasıyla ve hapis cezası istemiyle yarılanıyor.

Neyse, konumuz bunlar değil. Gençlerde çok ilginç bir olay anlatıldı bana. İki gazeteci arkadaşım, Şam'da Abdullah Öcalan'la konuşuyor. Öcalan bunlara inanılmaz bir olay anlatıyor... Bizim Mehmet Ali, bir süre önce kendisinden şöyle bir "ricada" buluyor:

"Sizinle yaptığım söyleşiler sonrasında Türkiye'de bana çok hücumlar oldu. Ben çok zor durumda kaldım. Şimdi sizden ricam, PKK çevrelerine ve adamlarınıza emir verin, bir raz beni eleştiren ve hatta tehdit kokan demeçler versinler. Böylece durumumu biraz olsun kurtarmış olurum"...

Abdullah Öcalan, gazeteci arkadaşlarımıza bunları gülererek anlatıyor. Arkadaşlar soruyor: "Siz ne yaptınız bu istek karşısında?" diye!... Öcalan, yine gülüyor.



TİR

Musa Anter



Mamûr

E rê li ber çavan memûr ne tiştê in, lê wekilê dewletê ne. Ma dewlet kî ye? Dewlet komek memûr in. Lê ji berê ve dewlet dêmek, memûr dêmek e. Ji ber vê xerîbiyê gelek alim li ser memûran mijûl bûne û xeber dane. Mesela Şêx Seîdê Şîrazî di alema îslamê de nîvêpêxemberek e, ji bo memûran li Şahê Îranê ve şîretê dike. Dibêje: "Şahê min tembiya min li te be zîlamê ku ne qenc be meke memûr. Lê yê qenc jî nabin memûr." Di vir de ne hewceyê gotinê ye, fîlozof dibêje Şah hez ji zîlamên xwe bike, giştîk ne qenc in ha?! A diduyan Arîsto û İbn Haldûn jî hema nêzikî hev ev mesele gotine, dibêjin: "Ordû, dewletê muhafaze dike, dewlet ordiyê xwedî dike, xwedîbûn bi mêl e. Mal bi îmara welêt e. Îmara welêt bi exlaqê qenc e. Exlaqê qenc bi waliyan e. Walî bi wezîran e. Wezîr jî bi serokê dewletê, ji memûr û tebaa xwe gişka re semboleke terbiyê, rastî û şerefê be.

De îca ka em îro li dewleta xwe binêrin. Ne ez dibêjim hema her roj di basina (çapemeniya) Tirkîyê de, dizî û bêdebiya memûrên mezin tê nivîsandin. Wezîr yanî bakanên me jî gelek caran şîrkên wan in.

Waliyên me jî Kozakçioğlu ye û dewlet başkanê me rebeno her roj bi deh cihan, ne dizîya wî ne hewcedariya wî, ne nelayiqiya wî namîne ku nayê gotin. Par subayekî telgraf dabû

Pirsek di devê Tirkan de ye dibêjin, "Emê ordiya xwe modernîze bikin", yanî emê wê nû bikin. Nûbûna ku dixwazin çi ne. Yanî silah in, lê rebenan nizanin ku pêşî divê serê xwe û modernîze bikin, ku serî xerabe be wê silah çi bike?



Turgut Özal gotibû: "Sayin Özal ez dikim nakim ez hîni te nabim, yanî ez te bi mezinayî qebûl nakim." Îsal jî xebatkarekî got ku, "Ez bimirim ez çav, dil, gurçik û kezeba xwe dikim weqif lê bi wî şertî ku ev perçên min ji Turgut Özal re lazim bin, jî divê hûn nedin wan." De îca di Tirkîyê de jîna me wilo derbas dibe, ji Tirkan re û ji Kurdan re jî çiqas zor e.

Pirsek di devê Tirkan de ye dibêjin, "Emê ordiya xwe modernîze bikin", yanî emê wê nû bikin. Nûbûna ku dixwazin çi ne. Yanî silah in, lê rebenan nizanin ku pêşî divê serê xwe û modernîze bikin, ku serî xerabe be wê silah çi bike? Hema çiqas silahekî nû tu bavê piyê yekî din an nîzane berde yan jî ku berde wê xwe merevên xwe pê bikuje. Îsal 70 e sal e, heta niha de vî milletê feqîr nexwar, venexwar li gora wextê bi silehan û bi piyê ordiya xwe vekir. Ji me xwedê heta niha, vî ordiyê jî me re yanî ji Tirk û Kurdan re kîjan miharebe qezenc kiriyê? Em li tarîxê dinêrin ku jî wê çaxê heta niha em ketibin kîjan miharebê piştî wê bi lihevhatinê me parçeyek ji welatê xwe wînd kiriyê û kuştina me jî, ji me re tê de maye. Ordîya me ev e. Memûrên me malûm in. Pirsê wan di devê xelkê de ye dibêje, "İro here sibehê were." Tu herî kîjan daîrê, memûrên me bi çavên dijîmanan li wetendaşan dinêrin. İmkana îşekî ku bê bertîl tu safî bikî tune ye. Memûrên dewletê gişk wek ebûqatan bi ucret ji xelkê re karan dikin. Ên wezîrên me jî li berçavan e. Tê û derin, welatî navê wan jî nas nakin, incex ku bi dizîya xwe tîkevin basinê, mirov wan nas dike. Hikûmet, reisêcumhûr qebûl nake. Reisêcumhûr hikûmetê qebûl nake. Xelk jî herduyan ne xweş e. Ji ber vê yekê memûr jî, ji wan natirsîn. Hele esker kengî qîma wan bixwaze li boriyekê dixin, pêl stûyê hikûmetê jî û dewletê jî dikin. Welêt dikin wek qışlakê. Cihê rehet û hezrolê û yesaxan. Di emrê xwe de min çar carî ev dîtin. Kemal Paşa pêl stûyê siltan û hikûmeta wan kir, Cemal Paşa pêl stûyê hikûmeta demokrat, Menderes û Celal Bayar kir. Di 12'ê Adarê de car din hikûmet û dewletê dan ber lîngan, di 1980'î de car din bavê sivîlan ordiyê şewitand û hin jî ew şewt e û dûxan ji me dere. Niha jî em nizanin wê kengî esker li boriyan bixe û me qelepeç bike.

İşte em xelkên Tirkîyê bi vî awayî li jiyana xwe dinîhêrin, ka bê heta em bigihin ku?

23.5.1992

Amedê silav da meclîsê



Grevên birçîbûnê yê ku ji bo piştigirî û destekkirina mebûsên Meclîsa Neteweyî li Stenbolê li avahiyên HEP û ÖZDEP'ê li dar ketine bi beşdariyêke mezin didomin.

Navenda Nûçeyan- Greva birçîbûnê ya ku li Brukselê bi 15 mebûsên Meclîsa Neteweyî, di 24'ê Çileyê de dest pê kiribû, bi geşbûn û firehbûneke pirralî ve didome. Greva birçîbûnê li Kurdistanê jî, bi livbazî û protestoyên girseyî û bi beşdariyên mezin ve hate destekkirin. Li Amedê, 12 hezar esnaf ji bo rojekê dikanên xwe girtin. Beşdariya vê livbaziye %100 bû. Li aliyê din, li gelek dibistanan jî, xwendevan dersên xwe boykot kirin û xwepêşandanan pêk anîn. Ev xwepêşandanan xwendevanan bi sloganên "Bijî Meclîsa me ya Neteweyî", "Bijî PKK", "Bijî Kurdistan" domiyan.

Girtiyên Girtîgeha Amedê jî, ji bo protestokirina kirinên dewleta Tirk û destekkirina greva Mebûsên Meclîsa Neteweyî dest bi grevê kir. Hêzên dewletê, li ser vê grevê êrîşî girtiyan kirin. Girtiyan jî, xwe parast. Nêzikî 200 girtî, bi êrîşên hov, birîndar bûn û nêzikî 50 girtî jî birîndarê xedar in.

Grevên birçîbûnê, li Stenbolê, Îzmîrê, Edenê û Mêrsînê jî dido-

min. Li Bazîd û Rewanê (Ixdir) esnaf û şofêran ji bo destekdayîna greva mebûsên Meclîsa Neteweyî dikan û erebeyên xwe girtin.

SERFIRAZIYÊK DÎPLOMATÎKÎ

Greva birçîbûnê ya ku 15 mebûsên Meclîsa Neteweyî ji bo protestokirina qetlîamên li Kurdistanê dest pê kiribûn, bi serfiraziyên dîplomatîk ve didome. Mebûsên Meclîsa Neteweyî, heta niha li konsolostiya Amerîka, Fransa, Îtalya, Îspanya, Awusturya, Yewnanîstan, Norwec û Avusturalya serdanan pêk anîne. Desteka gelek partî, mebûs û rêxistinên Ewrûpî standine.

Mebûsên Meclîsa Neteweyî, bi Konsolostiya Vatîkanê re jî, hevdiînek pêk anîn û desteka wan girtin.

Heta niha ji gelek welatên Ewrûpa, ji partiyên cur be cur bi dehan parlamenter, avahiya ku greva birçîbûnê lê didome, ziyaret kirin û destekên xwe pêşkêş kirin.

Greva li Brukselê, bi beşdariya

720 kesî û bi serfirazî didome. Heta niha li seriya 10 hezar kesî, cihê grevê ziyaret kirine.

Li Stenbolê jî, li 2 avahiyên HEP û ÖZDEP'ê grevên birçîbûnê dest pê kirin. Wekî din li Edenê û Mêrsînê jî, grevên bi vî rengî dest pê kirine. Li Stenbolê, bi banga komîteyêke Kurdên li vê herêmê li 2 taxan, di avahiyên HEP û ÖZDEP'ê de beşdarî greva birçîbûnê bûn. Greva birçîbûnê, li Ûmraniye di avahiya HEP'ê de, li Eminönü jî, di avahiya ÖZDEP'ê ya bajêr de, ji bo hefteyekê dest pê kir û didome. Her roj bi hezaran kes, ji bo serdanê têne cihên grevê. Her kesê ku tê, beşdarî kampanya înzeyê dibe û nameyek ji mebûsan re bi rê dike Brukselê.

Li ser grevên birçîbûnê yê li Stenbolê me bi komîteya tertîpkirinê Îmam Doğan re, axaftinek kir. Îmam Doğan pîrsa me ya li ser armanca grevê wiha bersivand: "Armanca vê greva birçîbûnê, protestokirina qetlîamên dewleta Tirk ên li Kurdistanê, destekkirina mebûsên Meclîsa Neteweyî û ji bo rawestandina vî

şerê bi qirêj e. Maneyêke ve grevê ya din jî ev e ku, li gor dîtina me, di Newroz û piştî Newrozê de, ihtimala qetlîamên nû heye. Ji bo vê jî, em hikûmetê îqaz dikin. Ev grev, wê hefteyekê bidome. Ji niha ve li seriya 250 kes di greva birçîbûnê de ne.

Me xwest dîtînen wan ên li ser avabûna Meclîsa Neteweyî hîn bibin. Meclîsa Neteweyî ji bo gelê Kurd di çi wateyî de ye û çi li têkoşîna neteweyî zêde kiriye?

Îmam Doğan bersiva vê pîrsa me wiha da: "Ger têkoşînen leşkerî, bi serfiraziyên siyasî ve neyên xwedîkirin, nagihîjin encamê. Em vê meclîsê jî, weke serfiraziyêke siyasî dinirxînin û

weke gel, meşrûbûna ve meclîsê nas dikin û diparêzin.

Êdî gelê Kurd dixwaze, bi îradeya xwe bê îdarekirin. Ev tiştên han, mafên xwezayî ne. Îro di meclîsên dewletên dagirker de, Kurd nikarin bi nasnameya xwe cih bigirin. Di meclîsa Tirkiyê de, ji bo du gotin bi Kurdî hatiye peyivîn, dinyayê radikîna pê. Ji ber vê jî, Meclîsa Neteweyî di vê wateyê de, qonaxê nû û bilind e. Wekî din, ev meclîs, meclîsa parçeyên Kurdistanê ye. Ji Kurdên Sovyeta kevin ta Sûrî, hemû Kurd, di vê meclîsê de temsîl dibin. Gelê Kurdistanê bi hêviyêke mezin li meclîsa xwe dinêre û deng didinê."

Li Norşîn esnafan kepenk girtin

Li navçeya girêdayê Bedlîsê Norşîn, esnafan ji bo protestokirina qetilkirina Abdullah Gencer û Seyfettîn Zengin kepenkên xwe girtin. Li ser girtina kepenkan, gelek mirovên welatparêz hatin girtin.

Weke tê zanîn roja 6'ê Sibata li Norşîn du karkerên Petrol Ofîsê, dema li ser kar bûn, dest û piyên wan ji aliyê kontrgerîlayan ve hatibûn girêdan û hatibûn kuştin. Ji bo protestokirina kuştina herdu karkeran esnafên Norşînê sê roj kepenkên xwe girtin. Li aliyê din, 23 esnaf û welatparêz ji aliyê polîsan ve hatin girtin.

Hereketa hundirîn berê xwe da girtîgehan

Navenda Nûçeyan- Dewleta Tirk bi "tevgera hundirîn" ve çî ji destê wê tê texsîr nake, pêk tine. Îro gel ji alîkî ve ji bo protestokirina kirinên dewleta Tirk ên li Kurdistanê û ji bo piştigirî û destekkirina mebûsên Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê di greva birçîbûnê de ne. Ji alî din ve jî, ji bo çêkerekirina kirinên dewletê bi partî, rêxistinên demokratîk û bi tevgerên parêzvanên mafên mirovan ve, di têkiliyan de ne.

Dewleta Tirk jî, ji bo guherandina rojê ku gelê Kurd bi çalakiyên xwe afirandiye, dixwaze ji holê rake. Heta ji bo Newrozê jî, dewlet ji niha ve dest bi çêspînen xwe kiriye. Ji bo raya giştî bixapîne

û berên wan ji bûyerên ku niha pê meşgul in, bizivirîne dest avetiye dîlên di zindanan de.

Hêzên dewletê bi leşker, serbaz û efserên xwe ve êrîşê Girtîgeha Amedê kirin. Êrîş di 4 û 9'ê Sibata 1993'an de pêk hat. Di herdu êrîşan de nêzikî 200 girtî birîndar bûn û ji wan 50 kes jî, bi xedarî birîndar in. Di herdu operasyonan de girtî, bi cop, qelas, texte, palaska lêdanên xedar xwarine. Hemû eşyayên wan zerar ji operasyonan dîtine.

Nameya ku ji Girtîgeha Amedê ji me re hatiye sedemên êrîşên hêzên dewletê diyar dike. Di nameyê de pesta hêzên dewletê yê li ser xwe wiha dinirxînin: "Rêve-

birên girtîgehê tevî serbaz û efserên xwe ve ku bi hinceta lêgerîna hatibûn qawîşa me, pêşî nivînen me tevlihev kirin, radyoyên me pirtûk, kovar û eşyayên me yê din dirandin û şikandin. Wan em derxistibûn cihê behnedanê, dîtina ku me dît bi fermana serbazan ku digotin, "lêxin, êrîş bikin..." Leşker bi cop, qelas, palaska û hwd. ve êrîşî me kirin."

Li ser êrîşa dawîn ji girtî û dîlên Girtîgeha Amedê daxuyaniyêke din jî kirin.

Di daxuyaniyê de li ser qonaxa ku gelê Kurd dijî radiwestin, girîngiya greva birçîbûnê ya mebûsên Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê tînin zimên.

Nûnerîtiya girtîgehê di daxuyaniya xwe de wiha dibêje: "Sebebê dayîna nûçeyên bûyerên Girtîgeha Amedê ku di BBC, STAR 1 Show TV de ew e ku livbaziyên mebûsên Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê ji rojevê derxin û bala raya giştî bikişînin ser bûyerên girtîgehê û çalakiyên mebûsan sabote bikin."

Di vê navê de girtî û dîlên Girtîgeha Amedê di roja 08.02.1993'an de dest bi greva birçîbûnê ya bêdawî kirin. Hemû girtî û dîl beşdarî grevê bûne.

Kesên ku di dawîya êrîşa girtîgehê de birîndar bûne, navê hincan ji wan ev e: Mucahit Sever, Behçet Donlu, Ercan Tanriverdi, Kadri Öz, Serhat Tuncer, Mehmet

Acet, Enver Özkartal, Ercan Taylan, Feyzulah Demirağ, Nusret Solmaz, Tahîr Elmas, M. Şîrîn Zorba, Abdullah Temel, Adnan Aslan İsmet Santolu, Kenan Çeker, Devrîm Çakmakçı, Sadik Tan, İlhan Akin û Hüseyin Kaşayel.

Liqa Amedê ya Komeleya Mafên Mirovan (İHD) bi daxuyaniyêke pest û pêkuyiyên dewletê yê ku li dijî mirovahiyê ne protesto kir û raya giştî vexwendiyê helwestkariyê kir.

Girtî û dîlên ku di Girtîgeha Mûşê de ne, li hember çêspînen dewleta Tirk ên li girtîgehan û ên li Kurdistanê ji bo sê rojan 338 kes ji nû ve dest bi greva birçîbûnê kirin.

Di 15 rojan de 15 sivîl kuştin

Navenda Nûçeyan- Di van demên dawî de, êrîşên ku li hember gelê sivîl tene meşandin, di her warî de zêdetir û tundtir dibin. Di nav van 15 rojên dawî de, di êrîşên bi vî rengî de, 15 kes hatin kuştin û 30 kes jî birîndar bûn. Di van êrîşên ku bi giştî li Diyarbekir, Pasûr, Hezro, Bismil, Şirnex û Cizîrê de didomin, gelek mal û dikan hatin îmhakirin.

Di hefteya borî de, li gundê Bismilê Gilgilo, 2 gundî ji alî leşkeran ve bi metodên hovane hatin kuştin. Resûl Bekiroglu û Sabrî Çetinkaya ji bo biçin gundekî cîran derdikevin rê. Li ser rê leşker gulle direşînin ser herdu gundiyan û bi birîndarî digirin. Trektora wan dişewitînin û serê van herdu kesan bi keviran

dipelçiqînin. Dû re wan tînin gund û cendekên wan didin gundiyan û dibêjin ev, "terorîst" in. Televîzyon û radyoyên Tîrkiyê jî, herdu gundiyan mîna "terorîst" beyan kirin.

Li Sasona ku girêdayîyê Batmanê ye, li mezrayên Horsal û Gomika malên gundiyan Kurd ji alî leşkeran ve hate şewitandin. Leşker dest nedan malên gundiyan Ereb.

Li Hezroya Diyarbekirê jî, hêzên dewletê xelkê bi zorê şandin malan û her derê, bi çekên giran gullebaran kirin. Ev gullebaran heta derengê şevê domiya û 7 dikan û gelek mal hatin xerakirin.

Çiyayên Cûdî, Gabarê û gundê dorhêla van çiyayan, ji alî balefiran ve tene bombekirin.

Firokeyên leşkerî, li ser riyên Cizîr, Silopî û Şirnexê erebeyan jî bombe dikin.

Hêzên leşkerî sewalên gel jî dikujin. Hêzên leşkerî li ser riyê Cizîr û Nisêbinê êrîşê ser qemyonên bi golikan barkirî dikin û 22 golikên esnafan dikujin. Xwediyên golikan vê êrîşê portesto kirin û leşkeran gilî kirin.

Li gundê Silopî Kurtko, 3 cendek hatin dîtîn. Ji cendekan serê yekî hatibû jêkirin û yê din jî bi îşkence û gulleyan hatibûne kuştin. Hêzên dewletê, van kesan mîna gerîla beyan kirin, lê gundiyan ku cendekan dîtine dibêjin: "Ev ne gerîla ne. Em kincên gerîla dinasin. Dibe ku ev şivanên gundên der û dor bin." Her sê cendek, ji alî belediya Silopî ve hatin şuştin û bi-

naxkirin.

Li Dêrika Mêrdînê, bi sedan kes hatin binçavkirin, Di nav girtiyan de, serokê HEP'ê ya navçeyê jî heye. Li gor agahiyên digihên destê me, gelek îşkence, zor û tahde li girtiyan hatiye kirin.

Gundê Nisêbinê Girmelî, ji alî 4000 hezar leşkerî ve hate dagirkirin. Gund, 2 roj di bin îşxala leşkeran de ma. Leşkerên Romê, di 2 rojan de 4 mal şewitandin û eşyayên 2 malan jî talan kirin.

Li Siwêregê, hêzên dewletê pêkutiyên xwe didomînin. Di van rojên dawî de, her mala ku cerdî ser dikin, ji xwediyê malê dixwazin ku portreyek Kemal Atatürk li malên xwe daleqînin. Ên ku vê daxwazê neynin cih,

bi îşkence tene cezakirin.

Cade û kolanên Farqînê bi leşker û polîsan ve dagirtine. Her roj bi dehan mal ji alî hêzên dewletê ve tene serûbin-kirin û bi dehan mirov tene girtin.

Li Hezxa Şirnexê, di operasyonan de, nêzîkî 150 kes ên sivîl hatine girtin.

Hêzên leşkerî li Qosera Mêrdînê 2 xortên sivîl bi gullebaranê kuştin. Ev herdu xort, ji demekê ve ye, ji bo xebatê li derveyê Qoserê bûn. Hêzên leşkerî, van herdu kesan mîna gerîlayên ARGK'ê beyan kirin.

Li Hezroya Batmanê, karkekek bi navê xwe Mehmet Boğuş, bi gullebaranê hate kuştin. Sedemê kuştina Mehmet Boğuş ne kifş e.

Gerîla êrîşên ser kontrayan didomîne

Navenda Nûçeyan- Gerîlayên ARGK'ê, di van demên dawî de êrîşên ser kontrayan ên xurtir û tundtir didomînin.

Li Batmanê gerîlayên ARGK'ê yê bajêr êrîş birin ser 2 kontrayan. Yek ji kontrayan li cihê bûyerê mir, yê din jî bi birînen xedar rakirin nexweşxanê.

Gerîlayên ARGK'ê, roja 8'ê Sibatê li taxa Karşiyakayê, li ser riyê van kontrayan sekinin û êrîşa xwe pêk anin. M. İhsan Yeşilirmak li cihê bûyerê mir, kurê wî Mehmet Yeşilirmak jî birîndar bû. Ev herdu kes, di kuştina gelek welatparêzan de cih girti-

bûn.

Li Wêranşara Ruhayê jî, kontrayek bi navê xwe Mehmet Kaya, bi êrîşeke gerîla hate kuştin. Cenazê Mehmet Kaya ji alî 4-5 kesan ve hate binaxkirin.

Endamên kontrayan li metropolan jî, ji êrîşên gerîla xelas nabîn. Li İzmirê, li taxa Kadîfeka- le, 2 endamên hizb-î kontra bi navên xwe Ayhan Koral û Sirri Kilit ji alî gerîlayên ARGK'ê ve hatin kuştin. Ev herdu kontra bi eslê xwe ji Batmanê bûn. Li ser navê ARGK'ê beyanek heta weşandin. Di beyanê de, sedemê kuştina van herdu kesan, wiha tê

diyarkirin: "Ev herdu kesên ku hatin kuştin li ser navê hizb-î kontra ji bo pereyan, di kuştina gelek welatparêzan de cih girtibûn. Ev herdu kes piştî mehke- mekirinê, cezayê îdamê standin û ev ceza hate înfazkirin. Wê êrîşên me yê li ser kontrayan bidomîn."

GERÎLA ŞANTIYA DSÎ ŞEWITAND

Li navçeya Gurgum (Me- reş)ê Narliyê, gerîlayên ARGK'ê, êrîşek birin ser DSÎ'yê. Ev êrîş roja 5'ê Sibatê pêk hat.

Di vê êrîşê de 5 dozer hatin

şewitandin. Buhayê van dozeran nêzîkî 5 milyarî ye.

GERÎLAYEK XWE KUŞT

Li gundê Silopiya Şirnexê,

Gergerê, hêzên leşkerî êrîşek birin ser gund. Gerîlayek bi navê xwe Hüseyin Gündüz ji bo bi saxî nekeve dest, bi bombeya di destê xwe de, xwe kuşt.

Li Misircê maleke fuhûşê ji holê rabû

Roja 5'ê Sibatê di îşactekê de 2 mêr û sê jinên ku fuhûş dikirin ji aliyê gerîlayan ve hatin kuştin. Li gor nûçeyên gihiştine destê me, Li Misircê zilamekî ku di nav milet de wek Dawidoyê Bere-dayê tê naskirin, jina wî Şahînet ji 20 salan zêdetire ku mala xwe wek kerxanê dixebitandin û jinên ku bêpere û bêimkan diman dixapandin û difrotin.

Bi êrîşa ku gerîlayan birine ser vê îşactê, Dawido, jina wî Şahînet, mişteriyekî bi navê Silhedîn Yalçın û du jinên din hatin kuştin.

Terora cerdevanên gundan

Navenda Nûçeyan- Di 7.2.1993'an de li navçeya Bedlîsê Güroymak, saet li der dora 19.00'an Abdullah Gencer (35) û Seyfettin Zengin hatin kuştin. Ev herdu kes jî karkerê îstasyona Kocamanlar Petrolê bûn û li dorhêla xwe mîna kesên welatparêz dihatin nasîn. Her yek ji wan bi gulleyek ku ji serê xwe xwarine pê çûne.

Li gor agahiyan, di dema bûyerê de 7 km ji wan dûrtir, bi beriya niv saetê hêzên dewletê rê birrîne û nasnameyan kontrol kirine. Li ser bûyerê lêzîmên kuştî Abdullah Gencer wiha peyivîn: "Abdullah û Seyfettin li dorhêla xwe mîna mirovên welatparêz dihatin nasîn. Hêzên dewletê dibêjin ku ev bûyer bûyereke şelandinê ye. Herdu kuştî jî dest û piyên wan girêdayî û bi gulleyek ku ji serê xwe xwarine pê çûne. Tu nap û şop li ser wan nîn e. Ev ne bûyerê şelandinê ye. Ev bûyer jî, bûyereke ji bûyerên "failê meç-

hûl in û em dizanin ev failê meçhûl çi ne."

LI MIDYAE TERORA CERDEVANAN

Cerdevanên navçeya Mêrdînê Midyadê jî, tahde û pesta xwe ya li ser gelê sivîl her diçe zêde dikin. Ji ber ku şofêrên teqî û minibusan ew li erebeyên xwe siwar nakin, rika xwe dane şofêran. Li wan gefan dixwin.

Li Midyadê bi taybetî serokê cerdevanan ku bi navê Serxweş Kemal tê zanîn, li ser şofêr û gelê sivîl terora xwe didomîne.

Şofêrên teqsiyan li ser livbaziyan cerdevanan wiha peyivîn: "Em wan li erebeyên xwe siwar nakin. Gava ku em wan li erebeyên xwe siwar bikin, dê gel me ji wan bijimêre. Ew neyarên qewmên xwe ne. Em naxwazin bibin dijminê gelê xwe. Ku em naxwazin wan li erebeyên xwe siwar bikin, vêca li me gefan dixwin."

Rastkirina nûçeyê

Di hejmara Welat a 50'yan de, di bin sernavê "Kontr-gerîla li her derê" de, bûyera ku li mal bombe teqiyabû, mîna êrîşeke gerîla hatiye nivîsin û malbat jî, mîna malbateke hizb-î kontra daxuyan bûye. Dû re hate hînkirin ku, ev êrîş ne ji alî gerîla ve hatiye kirin û tu tîkiliyên vê malbatê bi kontrayan re nîn e. Rastiya bûyerê zarok bombeyê li kuçê dîtiye û biriyê malê. Bombe li mal di destê zarok de teqiyaye. Ev nûçe ji hin çavkaniyên herêmê gihiştibû destê me û dema me ya lêgerînê tune bû. Lewre rojname diket çapê. Ji ber vê xeletiyê em ji malbatên kuştîyan uzrê xwe dixwazin û vê xeletiyê rast dikin.

Li Kerboranê 5 hezar kes meşiyar

Li gundê Baskîl a navçeya Mêrdînê Kerboranê, 5 hezar mirov beşdarî merasîma gerîla ku bi bernavê xwe Serdar (Abdülrahîm Ersoy) bû, bûn. Gerîla Serdar di 29 Çile 1993'an de, di şerek bi hêzên dewletê re de, tevî 4 hevalên xwe şehîd ketibû.

Cenazeyê Abdülrahîm Ersoy, di 4'ê Sibata 1993'an de, li gundê wî Baskîlê bi beşdarbûna 5 hezar mirovî re hate binaxkirin. Di merasîmê de, girsê gel, bi sloganên wek "Bijî Serok Apo", "Bijî PKK", "Lêxe gerîla lêxe, Kurdistanê bi rê xe", "Gerîla lêdixê, Kurdistanê ava dike" beşdarbûna xwe domandin. Di dema merasîma cenazeyê de hêzên dewletê mudaxleyî gel nekir.

Lê di 5'ê meha Sibatê de hêzên dewletê destûr neda gelê ku hatibûn ser gorê û wecibeyên dîni binin cih. Hêzên dewletê yê ku der û dora goristanê xistibûn çeperê, 400 kesî girtin. Hat daxuyan ku piştî çar saet bi şûn ve, ev kes hemû hatine berdan. Beşdarvanên merasîmê çar saet li Komandariya Tabûra Jenderme ya Kerboranê girtî dimînin û îşkence li wan tê kirin.

Kontra gundekî îşxal kirin

Nêzîkî 15 roj berê, 60-70 endamên kontra gundekî Farqînê bi navê xwe Garisiyajêrîn, ji gundiyan valakirin û tê de wargeh (kamp) danin. Ev koma kontrayan piştî ku gundiyan ji gund derxistin, li der û dora gund meterîsan (mewziyan) kolan û li serê banyan û girên der û dor balefirqewêr (uçaksavar) bi cih kirin.

Ev kesên ku gund dagir kirine, rûyên xwe bi maskeyan ve dişêrin û bi çekên giran pêçayî ne. Li gor agahiyên gundiyan ji gundên der û dora Garisiyajêrîn didin, êdî tu kes bi riyê vî gundî ve nikare biçê. Li ser vê, kontrola nasnameyan tê kirin û di nav gund de, komek tê perwerdekirin, koma din jî nobetê digire.

PÊNÛS



Amed Tigris

Serxwebûn yek e

Di bin bandora dewletê an jî di nav dewleteke biyanî de tu carî ziman û edebiyata neteweyên bindest an komên biçûk bi awayeke azad bi pêş nakeve. Geş nabe û gul venade. Dewleta serdest an jî ya xwedî bandor her çiqaş demokrat be jî, dîsa encameke baş nayê girtin. Ev di dinyayê de bê hejmar car hatiye ceribandin. Em dev ji dinyayê berdin, di welatê me de an jî di jiyana Kurdan de di vî warî de mînakên gelek berbiçav hene. Li Başûrê welatê me, ji dema Osmanî ve heta niha bi sed salan zimanê Kurdî serbest e. Ji ber ku Kurdên beşê Başûr berî di bin bandora Osmanî, pişt re Îngîlîz û di dawî de jî ketin bin bandora Iraqê ziman û edebiyata wan her çiqaş nehate qedexekirin û bikaranîn jî, lê niha jî wiha bi pêş neketiye. Hê raste rast gramer û alfabeke wan a tekuz nîn e. Ji derî xebata şexsî ferhengeke baş a kollektîv nîn e. Di dibistanan de pirtûkên dersê yê modern nîn in. Tiştên wan ên ku hene jî di rûpela yekemîn de fotografê Seddam, fort û zirtên Seddam hene. Bi Kurdî ansiklopedî nîn e. Rojnameyêke rojane nîn e.

Divê baş bê zanîn ku heta dewleta me Kurdan çênebe, ziman, edebiyat û kultura me bi pêş nakeve. Serxwebûna ziman, edebiyat û kultura Kurdî bi serxwebûna Kurdistanê ve girêdayî ye. Divê em her îmkân û reforman ji bo serxwebûna Kurdistanê amade bikin.

Li Sovyeta kevin jî, bi salan hinek kes li ser ziman, kultur û edebiyata Kurdî xebitîne. Rojname derxistîne, lê ji bo kê û ji bo çi? Iro encam çi ye?

Li Swêdê jî, 10-12 sal in ku di dibistanên Swêdê de dersên zimanê Kurdî tên dayîn, lê ji bo wê yekê jî, roj bi roj zarokên Kurd asîmîle dibin. Di nav civaka Swêdê de dihelin û winda dibin. Kurdên Swêdê weke yê Sovyeta kevin û Kurdên Anatoliyê nikarin xwe du-sê qerî jî biparêzin. Kurdên Anatolê di bin hemû metodên asîmîleyê de 300-400 salî li ber xwe dan û hin jî didin. Lê yê me yê Swêdê ku pirraniya bavên wan lîderên Kurdan bûn, di nav 10 salan de bûn Swêdî. Êdî ew di mala xwe de, bi Swêdî dipeyivin. Di vir de rola teknik û bajarvaniyê jî heye û mezin e. Li gundan mirov zû bi zû asîmîle nabe. Lê, li bajarên asîmilasyona gelekî bi lez û bez çêdibe. Radyo, tv, vîdeo û weşanên din di warê pêkanîna asîmilasyonê de roleke mezin dileyîzin.

Ji ber ku di nav sîstem û çerxa dewletê de ne mumkun e ku, zimanê bindest an jî biyanî bi pêş bikeve. Aparenta dewletê ava wî derdixe. Aparat di destê kê de be ew bi zor an jî bi aştî yê din dihelîne. Ji navê radîke. Dewlet hakîm e. Her çiqaş ew xelkên bindest nifûs pirrtir û bi ziman û kultur dewlemendtir be jî, dîsa yê xwedî aparenta dewletê wan dilehîne. Di dîrokê de mînakên wiha gelek in. Xelk an neteweyêke biçûk dewletê girtiye destê xwe û gelekî xelk û neteweyên jî xwe mezintir di nav xwe de winda kirine. Niha nifûsa Swêdê 8 milyon e. Îro jî Tirkiyê 5 milyon û jî Îranê 5 milyon mirov bêne Swêdê de di navbera 20-30 salan de bibin Swêdî.

Ev jî nayên wê maneyê ku ew welat û cihên ku îmkânên xwendin, nivîsandin û perwerdeya Kurdî heye, mirov dev jê berde. Na, ev ne rast e. Bervajîya wê divê mirov wan îmkân heta dawî bi kar bîne. Ji bo wan îmkân û fersendan têbikoşe.

Divê baş bê zanîn ku, heta dewleta me Kurdan çênebe, ziman, edebiyat û kultura me bi pêş nakeve. Serxwebûna ziman, edebiyat û kultura Kurdî bi serxwebûna Kurdistanê ve girêdayî ye. Divê em her îmkân û reforman ji bo serxwebûna Kurdistanê amade bikin. Ne ku ew îmkân, fersend û reforman li pêş serxwebûnê bikin asteng, diwar û pingar. Serxwebûn yek e.

Pêkhatina zimanê Norwecê

Gavan Koçer

Îro li Norwecê du zimanên fermî hene. Gelo ew çawa û di bin kîjan hoyên dîrokê de derketine holê?

Di zimanê Vîkingan de nêzî 800-1050 paş zayîna Îsa, li bakûr mirovan bi çandinî, berhemên deryayî jiyana xwe didomandin. Bi zêdebûna rûniştavanan ve derfet ji hemûyan re nema ku li vir bi qaîdyên berê bi-jîn. Ji ber wê yekê jî, gelê van deran ji welatên xwe dest bi koçberiyê kirin. Bi vî awayî jî zemanê Vîkingan dest pê kir.

Armanca Vîkingan bi destxistina welat û axên nû bû. Di destê wan de keştiyên (gemî), ku ji aliyê teknîkê ve pêşveçûbûn, hebûn. Bi yan jî bi hêsanî gelekî walatên nû kifş kirin, ji Stenbolê heta Amerîkaya Bakur (Newfoundland), Fransa, Îngîlistan û hin cihên din bi dest xistin û dagir kirin.

Vîking, bi taybetiyên talan û wêrankirîna ketin dîrokê. Di vî dagirkirîna de Norweciyan jî rîstekî mezin listin. Norwec jî, ji aliyê teknîka keştiyan ve pêşveçûyîbû.

Ev dem, ji Vîkingan re bi qezencên aboriyê ve gelekî tiştên din jî anî. Bi raman û dîtinên din vegeyîyan û ew jî bû sedama pêşvebirina çanda wan. Elfabeya Latîni di vî demê de hat peji-randin. Ola filehî jî, ji aliyê Vîkingan ve hat Norwecê.

Li gor dîrokan nişan didin, di dora sed sala hezarî (1000) nêzî sed û pêncî hezar kes li Norwecê rûdiniştin. Norwec bi qral û dêrê dihat îdarekirin. Erdnîgariya Norwecê zêde bûbû û bajarvanî dest pê kirbû û huner pêşve diçû. Gelekî berhemên heja wek Domkirken (kilîse), Nidarosdomen (kilîse) û Hokshalên derketibû holê. Di warê edebiyatê de jî berhemên heja hatibûn afirandin.

Ji ber wê yekê jî, ji vî epokê re zemanê mezinahiyê tê gotin.

Lê ev zemanê zêrîn pirr dom nekir. Di dor 1350'ê de nexweşiya reş (the Black Death) gihîştê Norwecê û nêzî nivî şeniye (nisfûsê) qir kir. Norwec ji her alî ve paş ve çû û ev jî bi xwe re serdestiya Danîmarqîyan anî.

Di dora sed sala 1300'ê de Norwec bi Danîmarqayê ve peymanî yekîtiye çêkir. Lê, serdestî û hêz di destê Danîmarqayê de bû. Danîmarqa, bûbû navçeya çand û politikayê, ji ber wê yekê jî li hemû Norwecê zimanê Danîmarqî bû zimanê nivîsandinê. Lê zimanê Norwecî jî wek zimanê qisekirîna dom kir. Çanda Norwecê jî jiya. Ev yekîti, ya ku bi Danîmarqê re bû, heta 1814'a dom kir.

Bi destpêkirina sed sala

1800'î re di şerê nav Îngîlistan û Fransayê de Danîmarqa aliyê Napoleon girtibû û wî jî şer winda kiribû. Ji ber wê yekê jî Norwec ji destê Danîmarqayê çûbû.

Norweciyan bi ev derfetê dixwestin dewleteke serbixwe çêbikin. Ji bo wê jî, kesên bi nav û deng hatin serhev û qanûnê esasi çêkirin. Li gor wê jî divê gel xwe îdare bike. Hêz jî di nav sê organên de hat parvekirin: Meclîs wê qanûnên ku civakê girê dide çêbike. Hikûmet wê li gor van qanûnan welat îdarê bike, û dadgeh jî wê daraz bidin û çavdêrî bikin ka qanûn li gor bihgehiya xwe tên bikaranîn an na.

Norwec di 1814'an de rizgar nebû, lê di rêça rizgariyê de gavên girîng avêt. Di van salan de yekîti bi Swêde re çêkir. Lê qanûnê xwe ya esasi û meclîsa xwe parast. Ev jî hisên wan ên neteweyî her roj zêde dikir û wan xwe wek neteweyek didît.

Lê heya vî demê zimanê Danîmarqî bûbû zimanê nivîsandinê û pirraniya nivîskaran nivîsên xwe bi zimanê Danîmarqî dinivîsandin.

Huner û lîteratur gihîştibû radeyêke bilind. Zimanê qisekirîna (axaftinê) jî gelekî zaryayîna cuda pêk dihat û zimanê nivîsandinê ya Norwecî tunebû.

Ji ber wê yekê jî, di warê ziman de porblemên neçareser kirî derketin holê. Di wî warî di munaqeseyên tund dest pê kirin. Gelo mirov çawa ve pirsgirêkê çareser dibe û zimanê hevpar diafirîne? Ramanên cuda cuda derketin holê. Lê yê ku pîrr bala mirov dikişîne dudo (2) bûn.

1. Divê ji zaravayan zimanê yekgirtî (hevpar) bê çêkirin.
2. Divê zimanê Danîmarqî bidome, lê di nav demê de bê Norwecî kirin.

Di xala yekemîn de zimanzanê Norwecî, Ivar Aasen, li der û dorê welatê Norwecê gerya û hemû zarave berhev kirin. Wî pirrtir bala xwe kişandibû zaravayên aliyê rojavayê Norwecê.

Li gor wî ev zarava zêdetir nezi zimanê Norwecî ye kevin bûn. Ew bi awayekî kûr van zaravayan dikole û ji wan zimanekî (1848-50) nû çêdike. Ji vî zimanî re iro "Nynorsk" (Norweciya nû) tê gotin.

Ivar Aasen, di xebatên xwe de giranî dide tîkiliyên nav ziman û civakê. Ew xebata ilmî ye zimanî, ji xelkê cuda nabîne û di vî warî de jî lêkolînekî xwedî berpîşyariyê ji xwe re dike armanca. Lêkolînen xwe yê zimanî ji prosesa dîrokê cuda nabîne. Lêkolîna û tîgihîştina ziman bîyî berçavkirina dîrokê nabîne.

dorhêliya Norwecê ew bû ku wî dixwest bi awayekî sistematîk zimanekî hevpar bibîne û zimanê gel şûn ve bide wan û wan bi baweriya rastiyê kesayetiya xwe bike.

Lê alîgirên çînî yê burjûvaziye diwaxestî zimanê Danîmarqî biparêzin. Ji ber ku di wê demê de, zimanê Danîmarqî zimanê nivîsandin û kar bû. Ew digotin: "Danîmarqî û Norwecî nêzî hev in. Ji bo wê yekê divê mirov zimanê nivîsandinê yê Danîmarqî bi gotinên Norwecî zêdetir bike. Norwecî yanî dixwestin gotin û formên Norwecî tîxin nav Danîmarqî û bi vî awayî jî zimanekî Norwecî çêbikin. Ev raman jî hat parastin û zimanekî jî li ser van celebên çêbû. Ji vî zimanî re jî iro "Bokmol" tê gotin.

Ji ber wê yekê ye ku, iro li Norwecê du zimanên fermî hene.

Nynorsk û Bokmol herdu jî xwedî statuyên fermî ne. Ango herdu jî wek zimanên neteweyî tên peji-randin. Ji ber ku jî sedî 17'ê Norweciyan Nynorsk tercîh kirin, di gelemperiya Norwecê de Nynorsk xwedî 25 (%)'ê ye. Di cihên fermî de bikaranîna herdu zimanan jî serbest e. Mînak kî dixwaze bi kîjan zimanê nûçeyên TV'yê amade bike, dike. Ev tercîha kesên ku nûçeyan amade dike ye. Lê cihên ku tê de Nynorsk tê qisekirin, bikaranîna Nynorsk jî sedî sed e.

Di xwendegahan de jî herdu ziman fermî ne. Lê, ew li gor hoyan tên guhertin. Pirranî di kîjan zimanî de be ew ziman bihgeh e, yê din jî wek zimanê alîgir (sîdemol) tê bikaranîn. Cardin herkes mecbûr e herdu zimanan hîn bibe.

Wekî din li Norwecê di herêmên lokalî de, pirranî devokên bikaranîn. Gel bi devokê xwe dipeyive û radyo û televizyonên lokalî bi vî devokê weşanên xwe diweşînin. Mirov bi vî awayî dikare bibêje, li Norwecê decentralization (berpîrsiyartî ji yek destê, navçê nayê belavkirin) heta radeyek cih girtiye.

Ev rêça han jî aliyê aborî ve dikare giran bibe, lê ji aliyên din ve gelekî berhemên heja daye.

Çavkanî:

- Norsk History (Dîroka Norwecê)
- Om norsk sprokshistorie (Der barê dîroka zimanê Norwecî)
- Norsk sprokforskning (Lêkolîna zimanê Nordiskê)
- Den samiske nasjonên (Dîroka Samîyan)
- Ordet (kovara ziman)
- Dyade (kovara çand û dîrokê)

Pîrozkirina sersalê: Dam û qirdikê damê



Jîr Dilovan

Heta berî niha bi neh deh salan dam (sersal) çawa digeriya û çawa dihat pîrozkirin? Ez dixwazim vê bidim xuyakirin.

Di salname (rojhişmar) Kurdan de, pîrozkirina sersalê cihekî bi rûmet û pîr girîng digire.

Berî sersalê bi hefteteyekê hazirî dest pê dikir. Li malên gelê Kurd, ji heft salî heta heftê salî hemû kes wehîr dibû. Lê wehîriya herî mezin a xortan bû. Xort, berî sersalê li hev û din dicivayan. Serê çend xortan komek pêk diantî. Wan koma bi hev û din re berberî dikirin. Her komekî qirdikek (palyaço) ji nav xwe dibijartin. Wî qirdikî gelek listik, gotin û dilokên tinazî (henekî) ji ber dikirin.

Demê serê salê dihat, êvara sersalê wan komên ku hazirî kiribûn, qirdikên xwe dixemilandin. Rûyê wan bi tenî û dimsê reş dikirin. Ji keşê, hiriye an jî, ji pembû rih û simbêl ji wan re çêdikirin. Kumikek didane serê wan. Cilên piz û fireh li wan dikirin. Hinekan zingilê pez dikirine stûyê xwe. Mal bi mal digeriyan. Çi mala ku di çûnê, qirdik hemû hû-

nerên xwe radixistin ber çavan. Tinaz dikirin. Dilok digotin. Direqîşin û gelek zirtêkî dikirin. Mirovên ku ew temaşe dikirin, ji kena piştezîk diqûlîbin. Piştî bernama qirdik xilas dibû, xwediyê malê dirav (pere) didane wan. Êdî ji wê malê berê xwe didane maleke din. Heta ku li hemû malan digeriyan. Di dawî de diravên xwe li hev par dikirin. Şeva sersalê wilo dihat borandin.

Roja din, zarokên gund, tûrên rengî diavêtin milên xwe û bi nava gund diketin. Mal bi mal digeriyan. Çi mala ku diçûnê, ev gotin digotin.

Dam û dam,
Kîskê qedem
Serê salê binê salê
Xwedê kurekî bide,
Kebaniya malê.

Pêyê wê gotinê re pîreka xwediyê malê nokên qelandî, mewîj, helil, bastêq, hêkên kelandî û neqîşandî li zarokan belav dikirin.

Pîrozkirina sersalê bi vi awayî dawî dibû.

Mixabin ev edetên me ji weke gelek edetên din ber bi windahiye ve çûne.

Ferhat ne tenê lehengî berhem jî ji me re hişt

Murat Ergin

Weşanxaneya Melsayê pirtûkeke Ferhat Kurtay bi navê **Güneşin Sarı Saçları** (Porên Rojê yên Zer) derxist. Weke tê zanîn nivîskarê wê pirtûkê Ferhat Kurtay ji kadroyên PKKê yên pêşî bû. Ew piştî 12 Îlona 1980'an kete Girtîgeha Amedê. Ferhat Kurtay di Girtîgeha Amedê de bi Mazlum, Hayrî û Kemal'an re pêşengiya berxwedanê dikir. Ferhat Kurtay di sala 1982'an de ji bo geşbûna berxwedanê û li dijî îşkence û zordariyên dewletê ew û sê hevalên wî xwe şewitandin.

Belkî ji çî ji ber jiyana wî ya têkoşer û çî ji bi tesîra berxwedana wî ya mezin a dawiyê, heta waşandina pirtûka wî kesaniya Ferhat Kurtay ya edebî li pêş neketibû. Bi rastî jî Ferhat Kurtay, şeroşgerekî ronakbîr bû. Lê wî huner û têkoşina şoreşê ji hev cuda nedifikirî. Heta dawiya jiyana xwe, li têkoşina neteweyî û civakî xebitî. Çiqas xwestibe jî nikaribû xwe bi temamî bide nivîskariyê; bi taybetî jî nivîskariya edebî. Lê di sala jî Ferhat Kurtay di jiyana xwe ya kurt de; jiyana ku bi lez û bez, bi coş û bi êş, jiyana ku herdem bi têkoşinê ve girêdayî û bi hêz domand de gelek mixabin ji bahoza edebiyata dilê


xwe yê mezin ji me re kulîlkekê tenê pêşkêş kir: "Porên Rojên yên Zer" Ferhat Kurtay wê kurteçiroka xwe di xortaniya xwe de nivîsiye. Di demeke ku bi pirranî jî xortên Kurdên xwendevan bi edebiyatê re eleqeder nedibûn de nivîsî. Lê di wê demê de jî, di dilê Ferhat Kurtay de nivîskariya hebû. Hezkirina xwendin û nivîsandinê ji zarokatiyê ve dihat. Vê hêzê wisa tîne zimên di nivîseke xwe de Ferhat Kurtay: "Weke her mirovî min jî bi îhtîraseke mezin xwest mektebê bixwînim. Hê ne diçûm mektebê ez nivîsê hîn bûbûm. Li gora dîtina min mirov diwê di her wextê xwe de tîjî tîjî bijî.

Bi tiştên ku hene re qet têr nebûm. Min jî îfadeyên klasîk hez nekir. Min xwest ez binivîsim heştên xwe, dilgeşî, xemgînî û hêzên xwe binivîsim. Her tiştî jî ber ku wext hespeke bi lez û bez e. Min çiqas dikaribû bi damuska (Yele) wê bigirim. Min pê girt." Erê Ferhat Kurtay jî xwendin û nivîsandinê ewqas hez dikir. Gava di Girtîgeha Amedê de bû jî, nesekîni û bi navê "Hawar" kovarek derxist. Di wê kovare de hem politîkî û hem jî edebî gelek nivîsên wî derketin. Pirtûka "Porên Rojê yên Zer" jî kurteçirokekê tenê çêbûye. Her çiqas

Ferhat Kurtay baş bi Kurdî zanibe jî ji ber ku wê demê zimanê Kurdî qedexê bû, hîn Kurdî bi sînor bû û ji hinek sedemên din wî wê kurteçirokê bi Tirkî nivîsibû.

Ev kurteçiroka Ferhat Kurtay jî bo zarokan hatiye-nivîsandin, ji bo zarokên ku hesreta xwendin û çûyîna mektebê kişandine, yê wekî wî. Bi rastî Ferhat Kurtay jî birçiyekî xwendinê bûye di zarokatiya xwe de. Jixwe gava wê kurteçirokê nivîsiye jî, ji zarokatiya xwe bi rê dîkeve û di şexsê serpêhatiyên xwe yên di pêvajoya çûyîna mektebê de hesreta xwendinê tîne zimên. Naveroka kurteçiroka pirtûkê li Kurdistanê li ser çûyîna mektebê hatiye bîngehkirin.

Di wê navê de serpêhatiyên qehremanê kurteçirokê Ferhat û hevalên wî carna bi êş, carna bi ken tîne zimên. Bûyer li gundekî Qoserê (Kızıltepe) û li Qoserê derbas dibe. Qehremanê kurteçirokê Ferhat pîr dixwaze here mektebê, emrê wî jî derbas bûye. Lê bavê wî ew neşandiye mektebê. Hevalên wî tev diçin mektebê û serê Ferhat li ber hevalên xwe yên xwendevan xwar e. Lê xwestina çûyîna mektebê ye di dilê Ferhat de, roj bi roj bi hêztir dibe. Û rojekê tê biryarekê didê; bi çî şeklî dibe bila bibe



ewê here mektebê. Û ji bo wê biryara xwe bi cih bîne, bi hevalên xwe re plan çêdikin. Di wê pêvajoyê de di serê Ferhat û hevalên wî de gelek tişt derbas dibin. Lê di dawiyê de Ferhat serfiraz dibe û diçe mektebê. Ferhat Kurtay, tiştên ku di serê qehremanê kurteçirokê de derbas dibe yê pêkenokî baş tîne zimên. Lê danîna hesret, êş û coşên Ferhat ne xurt e. Di bûyerê dayînan de bêhna mekanîkî tê. Teswîrên tebieta Kurdistanê gelek kêr derbas dibin. Bi rastî jî, ji alî edebî ve em bi giştî li wê kurteçirokê binêrin emê tê de gelek kêmasî bibînin. Helbet ev kurte-

ferhat kurtay güneşin sarı saçları



çirok ne wek kurteçirokên Çehov an jî Mark Twain in, lê ev welat jî ne Amerika an jî Rusya ye.

Jixwe Ferhat Kurtay gava wê kurteçirokê dinivîse, ji alî edebiyatê ve ne xwedî îdiayêke mezin e. Belkî "Porên Zer yên Rojên" ne berhemeke bêhempa be. Lê ya girîng di demeke dijwar de xebeta Ferhat Kurtay a li ser edebî ye.

Ji wê demê ka çend kes mane ku em iro nivîseka an pirtûkekewan dibînin an jî xebatek. Em dilgeş dibin tenê ku Ferhat Kurtay jî xeynî qehremaniya xwe "Porên Rojê yên Zer" jî, ji me re hişt.

Kurdistanê Kerkûk tê naskirin. Di sernava "Gurrî bûye Axa" de jî ferhengoka. D.Cano û M. Şêrgo ya bi Erebi-Kurdî tê rexnekirin. Ji xeynî van nivîsan di Stêr de gelek kurteçirok, helbest, stranên folklorîk û gotar hene. Bi rastî zimanê Stêr hêsan e. Lê di sala jî tê de gelek çewtî û di nivîsan de jî tashiî hene. Ji hinek bêimkaniya be gerek. Lê di sala jî em xebatkarên hevalên Stêr pîrozbahî dikin di wê xebata wan a girîng û hêja de...



Kovarek ji başûrê-rojavayê welêt: Stêr

Li Sûriyê ev heşt sal e ku kovarekê Kurdî bi navê Stêr derdikeve. Kovara Stêr wêjeyî, çandî û 47 rûpel e. Ji ber bêderfetiyan û şertên Sûriyê kovar jî alî teknîkî ve gelek qels e.

Di qapaxa kovarê de wêneya Rewşen Bedirxan heye. Di bin wêneyê de, bi hevoka "Cihê Te Buhîşt Be Dayika Hêja" Rewşen Bedirxan tê biranîn.

Di sergotara kovarê de bi sernavê "Namê Stêr" bi zimanekî edebî rewşa Kurdan û pîrozkirina Helbijartina Encûmana Niştîmanî ya başûrê Kurdistanê bi kurtî tê zimên. Namêya ku M.E. Bozarşan ji UNESCO re, li ser Ehmedê Xanî û Mem û Zînê nivîsandiye jî di wê hejmarê de cih digire. Ev nême di hejmara Welat a pêşiya

me de wê wek nûçeyekê derkeve.

Nivîskar Welat jî, di gotara xwe ya bi navê "Baweriyek" de li ser dîtînen ku di encama axaftinê li ser derxistin, weşandin, xwendin, nivîsandin û belavkirina kovarê û pirtûkên Kurdî disekine.

Di Stêr de, di bin navê "Ji welatê me" jî bajarên Başûrê



Hemoyê cerdevan

Ji ku zane, bê kî ye?
Ne xwendin, ne dibistan.
Xwe tim wilo dîtîye,
Şepirze kor û nezan.

Dinya wî tev çiya bû
Li ber berx û miha bû,
Qet li gund ne xuya bû
Dima li deşt û çolan.

Salê xwe carek dişûşt
Bêvil û çav bi kenîşt
Guran peze wî dikuşt
Ma kanî wilo şivan?

Berstika wî bi qirêj,
Gemar jê dibû tîrêj,
Ew Hemoyê kerr û gêj,
Tirkan kire cerdevan.

Ku çekê hildigire,
Li Midyadê digere,
Şûr simbêla nabirre,
Dibê ez im qûmandan.

Bûye bela serê me.
Qet berê xwe nade me.
Dûv û terrî jê kême,
Ew e kerê bê kurtan.

Hemî mîna Hemo ne,
Hiso, Elo, Celo ne.
Ew xulamên Tirko ne,
Rûreş in ji bo Kurdan

Nezanî ser wan bar e.
Ne qencî bo wan kar e.
Ji axa û began re
Bi kom dikin diravan.

Bo axan pariyê xweş,
Bo dijmin jiyana geş
Besî wan e rûyê reş,
Hestî dibin para wan

Xira kin dekê neyar
Ey cerdevanên hejar
Berdin wan axayên har
Dilşa be Jîr Dilovan

Jîr Dilovan

Kamiran Alî Bedirxan

Seyîdxan Qoric

Nivîskar, zana, mamoste û welatparêzê Kurd ê navdar Kamiran Alî Bedirxan, 14 sal berê li Parîsê çû ser heqîya xwe.

Kamiran Alî Bedirxan di 21'ê Tebaxa 1895'an de li Stenbolê ji dayîka xwe bûye. Kamiran Alî Bedirxan, ji mala Mîrên Cizîrê Bedirxanan e. Çawa tê zanîn kalê wan Bedirxan Beg, di 1847'an de li dijî dewleta Osmanî serî hilda. Bedirxan Beg dixwest ku, gelê Kurd di bin serokatiya xwe de bicivîne û Kurdistanê serbixwe ava bike. Dewleta Osmanî bi hêzên giran êrîş birin ser Botan. Sultanê Romê zora Bedirxan Beg bir. Mîr Bedirxan di 1848'an de tevî malbata xwe sarederê (sirgûnî) Gîrîtê bû û paşê jî çû Sûriye. Di 1868'an de li Şamê çû ser heqîya xwe, pîrriya zarok û neviyên Bedirxan Beg li ser rîya kalê xwe meşîyan.

Di nav hemû tevger û rêxistinên Kurdan de ji malbata Bedirxanan çend kes hene. Wan ji bo rizgariya Kurdistanê pîr xebatên bi rûmet kirine. Wan li xerîbiyê gelek tengasî û rojên ne xweş derbas kirine, lê hêviya xwe her tim parastine, xebatê xwe berdewam kirine.

Ji kurên Mîr Bedirxan, Emîn Alî Bedirxan (1851-1926) Hiqûqnas bû. Wî li Stenbolê pîr xebatên hêja kir. Bi hevalên xwe re gelek kovar û rojnameyên Kurdî derxistin. Wî serokatiya duymîn a "Kürt Teali Cemiyetî" kir. Mikdad Mîthath Bedirxan di 1898'an de li Qahirê rojnameya "Kurdistan" derxist. Rojnameya Kurdistan 31 hejmar weşîya. Birayê Kamiran Alî Bedirxan, Sureya Beg (1883-1938) li Misirê serkariya "Kürdistan Komitesi" kir. Paşê bi birayên xwe yên din re, di partiya "Xoybun" de xebat kir.

Kamiran Alî Bedirxan lawê Emîn Alî Bedirxan e. Wî li Stenbolê xwendina hiqûqê xelas kir. Di dema Şerê Cihanê ye Yekemîn de heta 1922'an tevî herdu birayên xwe ji bo rizgariya Kurdistanê şer dîke. Ew li Stenbolê di komele û rêxistinên Kurdan de cih digire û di rojnameya "Jîn" de dinivîse.

Di 1922'an de bi Celadet Bedirxan re, bi hev re diçin Almaniyayê, li Zanîngeha Hiqûqê teza xwe ya doktoriye dinivîse.



Kamiran Alî Bedirxan

Paşê diçe Rojhilata Navîn, bi hevalên xwe Memduh Selîm Beg, Sureya Bedirxan, Celadet Bedirxan û Îhsan Nûrî Paşa re, di 1927'an de partiya "Xoybun" ava dikin.

Armanca Xoybûnê serxwebûna Kurdistanê bû. Wan bi veşartî karê serhildaneke neteweyî kir. Di 1927'an de heta li Çiyayê Agirî di bin serokatiya Îhsan Nûrî Paşa de serhildan dest pê kir. Serhildan heta 1930-31'an dom kir. Piştî şkestina serhildanê, Sureya Bedirxan diçe Misirê, Kamiran diçe Bêrûdê û Celadet Bedirxan li Sûriye dimîne.

Celadet Bedirxan li Sûriye pêşî kovara Hawar (1931-1951) û paşê jî kovara "Ronahî" diweşîne. Kamiran Bedirxan ji bo kovara Hawar û Ronahî nivîsên Kurdî û Fransîzî dinivîse.

Kamiran Bedirxan zimanê Kurdî, Farsi, Erebi, Fransîzî û Almanî zanibû. Ew li Bêrûdê ebûqatî dîke. Bi birayê xwe Celadet Bedirxan re gelek ronakbîrên Kurd li dora xwe civandin û ji bo parastin û pêşxistina ziman û edebiyata Kurdî gelek xebatên bêhempa kirin. Bi tîpên Latînî alfabe-

yekê amade kirin û dev ji alfabe ya Erebi berdan. Li ser rêzimana zimanê Kurdî xebatên pîr baş kirin. Rêberiya edebiyata Kurdî ya nûdem, kirin.

Kamiran Alî Bedirxan di meha Gulana 1943'an de li Bêrûdê dest bi weşandina rojnameyê hefteyî "Roja Nû" (1943-1946) dîke. Li vir gelek nivîs li ser edebiyat û folklorê Kurdî, diroka Kurdistanê û bîr û baweriyên xwe û li ser pîrsa Kurdistanê dinivîse. Wî di 1943'an de Çileyê 1943'an de kovarekî mehane bi navê "Stêr" weşand. Ev kovar tenê 3 hejmar derket. Wî, doza yekîtî û serxwebûna Kurdistanê dikir. Wê gavê hemû serhildanên gelê Kurdistanê hatibûn şikestin. Li Kurdistanê xewna mirî hebû. Kovarên herdu birayan wek stêrkek ronahî dida Kurdistanê.

Kamiran Alî Bedirxan di sala 1947'an de diçe Fransayê û li Parîsê bi cih dibe. Di 1948'an de li Parîsê "Navenda Lêkolînên Kurdî" (Kürt Araştırmalar Merkezi) ava dike.

Li vir gelek ronakbîrên Fransîzî mîna Thomas Bois, Roger Lescot, Pierre Rondot,

Sartre û yên din alîkariya wî dikin. Di eynî salê de bi komîteyek ji bo mafên Kurdan memorandûmek dide "Rêxistina Yekîtiya Miletan" (UNO).

Dr. Kamiran Bedirxan di 1950'an de, di Zanîngeha Sorbonê de, dersên zimanê Kurdî dide û heta teqawitbûnê, vi karî dimeşîne. Di 1954'an de dizewice. Di 1961'an de pêwendî bi serokê tevgera neteweyî ya başûrê Kurdistanê, Mistefa Berzanî re datîne û nûneriyê tevgera neteweyî ya Ewropa dîke. Li vir têkoşîna gelê Kurd dide nasîn û alîkariya kes û rêxistinên pêşverû, humanîst distîne.

Doktor ji bo gelê Kurd karên siyasî yên girîng kir. Di sala 1970'an de tevî jina xwe diçe başûrê Kurdistanê û demekê li vir dimîne. Dr. Kamiran Alî Bedirxan 14 sal berê di 4'ê Kanûna 1978'an de li Parîsê di 83 saliya xwe de çû ser heqîya xwe.

Wî heta roja mirinê ji bo serxwebûn û azadiya Kurdistanê karên bêhempa kir. Gelê me tu car ew lawê xwe ji bîr nake. Bila dilê wî şad, axa wî pîroz be.

Afirandinên wî yên hatine weşandin:

Alfabeya Kurdî
Alfabeya Min
Zimanê Kurdî
Rêzimanê Zimanê Kurdî
Fehenga Kurdî
Zimanê Mader
Destpêka Xwendinê
Parçeyên Bijarte
Xwendina Kurdî
Tefsîra Quranê
Dersên Şerîetê
Çarînen Xeyyam
Proverbes Kurdî (Pêşgotinên Kurdî, bi Lucy Paule Margeritta re, Parîs 1937)
Şihîrên Kurdî
Der Adler von Kurdistan (Eylöyê Kurdistanê, bi Herbert Örtel re Berlin, 1937)
Berfa Ronahiyê
La Lyre Kurde (Şihîrên Kurdî)
Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer
Çavkanî:

1. M. Uzun, Destpêka Edebîyata Kurdî, Weşanên Beybûn, Ankara 1992
2. Dr. Kamiran Alî Bedirxan, Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer, Özgürlük Yolu Yayınları 1986
3. M. Uzun, Celadet Bedirxan'ı Anarken, Berhem, hejmar:5, 1989
4. Evindarê Ibo, di 14 saliya mirina xwe de Kamiran Alî Bedirxan, Azadî, hejmar:29, 1992

Ji awirên Medîna Emer re!

MOSKOV
RIZGAR

Erê Medîne, Medîna Emer!
Kî dizane ku tu dê sibe bibi komutana kijan refa gerîlan. Na... Bibore, belkî tu di Artêşa Parastina Kurdistanê de, bibî serleşkerê mezin.

Erê Medîne, tu hîna biçûk î, lê xuya dike tu gelek dûr dibînî, gelek tiştan dizanî.

Xema nexwe Medîne. Sibe wê rewş were guhertin. Niha waqê-waqê "mehmetçikên qehreman" e. Ne heyf, hevalên bavê te, gerîlayên me çawa nêçîra wan dikin. Van rojan, mehmetçik gelekî şerpeze, belengaz û jihevketî xuya dikin, diqirîn, dizûrin, diricifîn, ditirsîn, birçî ne, bê xew in û nizanin ku wê gaveke din çî bi serê wan were.

Ne heyf. Êdî mehmetçik ji siya xwe jî ditirsîn. Kevir, dar û berên çiyayên me, li ber çavên wan mîna dêwan xuya dikin. Çî dema çavên wan bi bilindahiya çiyayên me û kûrahiya geliyên welat dikevin, kabosa mirinê wan digire. Çokên wan dişkên û... Ne Eşref "efendî" û ji hezarên mîna Doğan Güreş nikarin bi hewara wan bîn.

Medîne! Vê dawiyê dema mehmetçikan êrişê Başûr kirin, mîna keriyên pezan rastî mayînên hevalan hatin. Lingên wan pirr erzana bûn. Cota lingan kesekê bi du qurûşan jî nedikirî.

Medîne! Niha li Tirkîyê artêşke bê lingan çêbûye.

Ez heyrana gerîlaya me. Çî hîne wergirtina tolehildanê (intiqamê) bûne.

Medîne!
Hema çend deqeyan Şêx Seîd, Nûrî İhsan Paşa û Seyit Riza, seriyên xwe ji gorê rakiribana, hey ho... Wê çendî kêfxweş bûbûna, wê gavê wê serê xwe bi riheî daniyana. Bila dîsa serê xwe daniyana xewê, xeweke rihet, xeweke şîrîn. Şêx Seîd, wê bi çavên xwe bidîta ku, gotinên wî yê li darvekirinê vala neçûne û hezar carî bigota "elhem-

dullallah".

Hevala Medîne! Tu hîna biçûk î, lê ji awirên we gelek tiştên fêmkirin. Di çavên we de, mirov dikare romaneke dirêj bixwîne.

Medîne! Tenê di şerê Dêrsimê de (1937-38), bavên 70 hezar hevalên te hatin kuştin. Dibe mirov ji bir bike? Na...

Medîne! Hedana me, bi hebûn û geşbûna we tê. Şerê me, îro, şerê ji bo parastina we ye. Em dixwazin hûn sibê di artêşa avakirina Kurdistanê de bibin leşker. Na... Bibore, bibin serleşker.

Medîne! Bapirê te berî heftê salan, ji Wanê, ji ber zora dijminê xwînxwar revî bû. Lê, heyret, bawer bike zimanê te mirovan dihelîne. Kê te bibîne wê bawer bike ku hûn hîna do, sibê zû ji Wanê hatine vir. Ji miradan re hema gotineke tenê jî bi zimanê biyaniyan nayê ser lêvên te.

Bila tim hebe ew bawerî û şerefa ku, tu Kurdeke paqij, bi rûmet û pakî parastî.

Bila tim hebe, Kurdayetîya bi birayîta miletan bawer.

Bila tim hebe, bedewetî, xeml û xêla te.

Bila tim hebe miletê te, Kurd, Kurdê şîr helal.

Medîne! Gundê we Avşên, hemû av û şênahî ye. Gundê we mîna hemû gundên Şîrnex û

Cizîra Botanê ye. Gundê we, weke gundê bapirê te ye.

Medîne! 70 salan komunistên sexte ji Moskov re nimêj kirin, bûbûn mîna murîdên rihdirêj, bêaqil û bêmejî. Dixwestin kenê xwe bi miletê me bikin. Gelekî kenê xwe bi miletê me kirin. Lê, xuya bû ew mirovên herî prîmitîv û paşverû ne.

Medîne! Tu dizanî Moskovê çî diyarî da me? Gazên kimî, erê, gazê kîmyewî

Medîne! Li Helepçê pênc hezar hevalên te, dê, bav û mîrên mezin mirin. Medîne! Li Helepçê 36769 teyrik mirin. Heywan, sewal û pez jî bê hesab. Lê wijdana Ewrûpa "medenî" û Sovyetê "dostê mezin" neliviya.

Medîne! Serok-merokan fedî nekir. Bi germî "qehremanê" Helepçê hembêz kirin û rûyê wî jî maç kirin. Niha, dîsa ji riha bavê xwe fedî nakin. Bûne propagandîstên xulam, erzana û nezana ên dewleta Tirkîyê.

Medîne! Xulamî gelekî li bejn û bala wan tê.

Medîne! Me derdê Sovyetê gelekî kişand. Niha jî (Berazên Sor) buhayê 60 milyon dolar çek û silehên giran diyarî dijminê me dike.

Lê, tiştê nabe Medîne. Bawerîya me bi dilên we, bi hevî û awirên we tê. Bawerîya me bi mirovatiya mirovan tê.


Xema nexwe Medîne. PKK wê bê guman bi ser bikeve.

Medîne! Bibore, min got: "Ezê çend gotinan li binê wêneya Medîna delal rêz bikim." Lê, va ye ev nivîs mîna nameyêkê dirêj bû. Ez çî bikim Medîne?

Carnan pênûs qebûl nake raweste. Carnan pênûs banî wijdana mirovan dike, xwe bilivîne. Lê, hene ew mirov jî ku, wijdana wan qet nalive.

Medîne! Ez vê carê bême Avşênê, ezê esch dîsa werim mala we. De haydê, bi xatirê we, rojbaş.

AZADÎ

Abdurrahman Durre


Rojiya Belçîqa û heca Suleyman

Îsal saleke pirr xerîb e. Belçîqa rojî digire, Silo û Çeto jî, diçin hecê. Li ser navê Demokratên Xiristîyan, Senator Hugo Van, bi karker û şoreşvanên Kurd re, li hember zilm û zorê dikeve rojiyê. Li ser navê viroqratên dilgawir û devmusulman jî, serokê Diyanetê Nûrî Yilmaz, bi 'Ebûcehil'ên Erebiştanê re ketiye pey hestîkoyîyê. Bi awayekî din, Îsa û Muhemed, xiristîyan û musulman, Kurdistan û şoreşvan bûne yek û yarî dikin, Nûrî û bêîman, Çeto û Suleyman, Erebiştan û Tûran, Ebûcehil û Ebûsufyan jî, bûne kek û xwarî dikin. Xulase; Silo û Çetîn diçin hecê, tîm, polîs û leşkerên wan jî, dikevin Licê.

Bi rastî jî, ev sal saleke pirr girîng û xerîb e. Dinya, demokrasi û mafên mirovan dixwaze. TC jî, li pey tûranîzm û faşîzmê dibeze. Ji bo Tirkên Qibris, Bosna-Hersek, Gaga-

wûzên Sîbîryayê, Tatên Qafqasê dewlet û azadî dixwazin, Kurd û Kurdistanê talan dikin, înkâr dikin, nav, nîşan, çand û zimanê wê xerab û wêran dikin.

Gele Kurd û şoreşvanên Kurd jî, sonda namûsê xwarine, sozê şerefê dane ku yan bimirin, an jî azad bibin. Ji ber vê yekê jî, em dibêjin, rewşa îsal pirr rewşeke girîng û giran e.

Bajarê Brukselê bûye Amed, Botan Serhed û Kurdistan. Bi hezaran mêvanên tîm û diçin, bi sedan rojnamevan, rêzan û diplomatên Ewrûpa, tîm temaşa rojiya mebus, şoreşvan û karkerên Kurd. Di rojname û televizyonên Ewrûpa de, deng û behsa wan roj bi roj geştir dibe. Bi bawerîya min, çiqas bidomînin dê ewqas girîngtir û geştir bibe. Gelek bala gelên Ewrûpayê dikişîne û vê mesajê dide wan ku gelê Kurd û şoreşvanên Kurd demokrat in, mafên demokratîk û însanî dixwazin, azadî dixwazin, ne anarşîst û eşqiya ne. Anarşîst û eşqiya, ew kesên faşîst û dijminê azadî û serxwebûna gelan in, dagirker û talankerên xwînxwar in.

Di roja 30-1-1993'an de, ez û çend hevalan jî, ji Holandê çûne Brukselê. Bi rastî jî, dema min ew civat, ew menzere û wê rewşa mezin dît, ez lê şaş û mat mam. Min bi temamî bawer kir ku êdî wê gelê Kurd jî bigihîje mirazê xwe û azadî, mafên însanî, demokrasiyê, tu hêzê dî pêşiya vê lehiya azadiyê nagire. Ne çivên Demirel, ne virên Erbakan, ne kuştin, ne talan, ne caşik û ne palan. Divê herkes eqil û hişê xwe rind bîne serê xwe, meseleyê di nav şertên demokrasi û mafên mirovahiyê de, bibişkêvin û hel bikin.. Fêdeya derew, xapandin, çiv û çûvan tune ye û nemaye.

Senatorê Belçîqî Hugo Van Rampaey, ji me re wiha axivî: "Ev rewşa demokratîk, serfiraziya gelê Kurd e. Êdî Ewrûpa dev ji mafên gelê Kurd bernade. Ez meselê rind dizanim, li hemû Kurdistanê geriyame, hemû tiştî dizanim, kar û xelasiya gelê Kurd û gelê Tirk hemû, di naskirina mafên Kurd û azadiya Kurdistanê de ye, biratiya herdu gelan bi demokrasiyê dibe, ji bilî vê tu çare tune."



Medîna Emer, gundê Avşên, navçeya Elegezê

Jinî Kurd

ZAGROS ZERDEŞTÎ / SORANÎ

Xeslete taybetiyekani jinî Kurd û diyarde berçawekan û cudahiyan le jinanî dewlete dagirkarekani Kurdistan.

Têrwanînek le mejuyî pir karesatî Kurdistan û dagirkirdinî Kurdistan be dirêjayî sedan sale, eweman bo derdekewêt ke hemî e barî jiyani gelî Kurdistan, rew êkî nasayî û nadilniyaî buwe.

Dîrokî gelî Kurdistan pirre le serheldani yek le duwî yek, ewey ke giringe lêreda ke pencayî bo rabîkê in ewey be dirêjayî em mejuyî gelî Kurdistan le layen dagirkaran ewa netwanrawe gelî Kurdistan bitwênirê tewe û zimaneky le nav bibrêt herçenda ti arî raguzan û be komel ku tin û dizîni serwet û samani serzemîni û jêrzemîni xaki Kurdistan û dizîni hemu behakani Kurdistan le kurtur û mejuyewe... htd. Ewey cigayî rastî û pir anaziye, jinî Kurd heme rolekî mezîni wazîkirdiwe, le dakokîkirdin lebonî Kurd, hemî e jinî Kurd hewênî Kurdayetî û serheldanekani buwe.

Daykani Kurdistan be dengebesozekyan hezaran hezar honrawey (îr) folklorî derbarey azayeti, ceng, mirovayeti, xwo ewistî welat, welatparêzî, komelayeti, xworagiri bo zarokekanyan debêjin. Le heman kat da jinanî Kurd bunete gencîney zimanî Kurdî û parîzgarîkirdin le bonî neteweyiman.

Jinî Kurd nêzîktîrîn mirove le zarokekey xwoyewe, serçaweyî jiyani zarokekeyeti, ke wata ême debêt anazi be jinanî Kurdistanewe bikeyn êmcy piyaw agirdî ew dayike mamosteyanên ke fêr zimanê Kurdî û xwo ewitî, welatparêziyan kirdiwin. Lorî lorî ew dayik û jina Kurdane, agirdani co dani xebatmane. Numuneyî lorî lorî daykî Kurd bo zaroke sawakey.

Lay laye role, korpem lay laye...

Ewgar direnge bo xewt naye? Boye dest û pêt be destrazey ben...

Debestim wêney kelepçe û

pêwend...!

Ta bo rizgari em Kurdistane silnekeytewa le bendinxane.

Rolî jîni Kurd tenya le perwerdekirdim zarokda nebuwe...! Belku jinanî Kurd hemî e le pê ewa û orewgerane berengari azad û çewsenewe bunetewe ke beramber xak û netewekeyan kirawe. Legel em barî çewsanewê da, le komalgayî Kurdistan da jinî Kurd be ew perî le xwe birdin û kolnedanewe berengari estemekan hatiwetewe. Ta radeyekî zor ba jinî Kurd le naw komalgayî Kurdistan da cigayî xoy diyari kirdiwe, zor caran wek serkirdê û hunermend û mirovî niştîmaniyan tiya helkewtuwe, ke le maju da debêt be anezîwe nawayan tomar bikirêt. Em xebatey jinanî Kurd piyawî Kurd pêwendiyê feodalî û derbegekani î pêrawete ser çok ke netwanin em rastiya bi ernewe.

Jinanî Kurd, le serhildanekani bakurî Kurdistan da le Dersim, Agiri we her weha hemu serheldane kanitiri da roleki pir aneziyan binîwe, ke neteweyî Kurd debêt hemî e anaziyan pêwe bikat. Katêk supay (le ker) dagirkerî Kurd ke deyanwîst ew jina Kurdane yexsir biken û biyankane pendî zimane, jinanî Kurd be em jêrdesteyiye razînebnun boye le ser lutkeyî çiyakane xoyan firê dida xwar ewe ta ber destî dujminani dagirker nekin û jiyani ser oriyan pesend nekird, razîbun be ewey ke le dol û dund û çiyakani Kurdistane dagirkirawekeyanda be serberzî giyan bibexî in.

Mejuy gelî Kurd anazi bew jinanewedekat ke hemî e êrî meydan bun, le pêrawî gel û xake dagirkirawekeyanda bunete çiray ru-

nakî ewezeng û rêpi anderi newey de hatuyan. Mesturey Erdelan î yekêke lew ajinancy ke le mejuy Kurd da paye û pileyekî taybetî heye, Mesture le Şahrî Siney xorhilatî Kurdistan le dayir buwe. Hunermendekî payeberz le ziman û wêjeyî Kurdî da destekî balay hebewe yekêke lew jinancy ke mejuy mirî Erdelanî be zincîre nusiwetewe, mirovokî niştîmanperwer û xawen hunerbuwe diwanekî honrawe (îr) heye.

Yekêkî tir lew kela jinane Hepsaxanî Nekibe le Bajêrî Silêmanî le salî 1881 le dayik buwe, le 15.4.1953 be nexwe î êrpençe koçî dawî kirdiwe. Hepsaxan jinîki dil nermî rewit berz û niştîmanperwer û mirovperwer buwe, raberêkî rastakîney jinan buwe le ruy komelateyewe. Nek her le layî jinan xo ewist buwe û anezî pêwe kirawe belku kesayetiyekeyî way bo xoy duristkirdiwe ke niştîmanperweran sercem anazi pêwe biken. Hepsaxan destekî balay heba bo hundani xwendewarî û Kurdeyati, hemî e hanî gelî Kurdî dawê bo xebatî rizgarî û serbixoyî. Le salî 1930 da nameyekî derbarey malî neteweyî Kurd nusîwe bo (Mafî Netewekan).

Hewlekî zorî dawê bo kirdinewî têrgeyck bo agidan (xwendevan) î jinan xo î buwete yekêk lem agidane, em dibistana (mektep) yekem fêrgeyî jinan buwe le mejuy gelî Kurde, xanukey xoy kirdiwe be fêrge. Katixoy nameyekî nard bo Serokî Komarî Millî Kurdistan 1946 Qazî Muhamedî supasnameyî bo nard. Jinî Kurd tuwanîwêti le mejuy xoy da destelat biçespênêt. (Dare Mirwarî) yekêke le newekani (Salahaddînî Eyubî),

jinêkî karzan û aza û durbin buwe, tiwanî bibête fermanraway mizru am, lev perî serbestî û destelat da fermanraway kirdiwe ûwanî supay (fereng) têk bi kênêt ke deyanwîst Misr û Felestîn dagir bikên. Mejuy jinî Kurd mejuyekî cudaye legal jinanî dewr û pit da.

Kar û xebatî jinanî Kurd le roji em ro da kar û xebatekî gelek kurse, le naw komalgayî êstay Kurdistanda cigay xoy diyari kirdiwe ew sinore xêlekayeti û feodalî bezandiwe, beledayikbunî PKK jinanî Kurd le jêr rabirayeti PKK da hengawî meziniyan halnawe, be erkî mejuy xoyan heldestin. Jinî Kurd ew rastiya çak dezanin eger bêtu bajdarî le orejî rizgarî niştîmanî da nekat netwanî daway azadî û mafekani xoy bikat, gelêkî pê kewtu bextewer berçaw nakewê lem çihane da eger bêt û "jin ke niwey komal û daykî niwekeytirî e" durbe le xebat, ew komalgaya eger çî sinorî ramyarî û dewletî xe yan hebêt komalgayekî nexwe e çunku jin tiyda dil û jêrdesteye. Jinanî Kurdistan rojduwayroj le dewrî ore e rizgarîwaze key ko debêt ewa be raberayeti PKK. Jinî Kurd hemu hêzekî xoyan le pêrawî Kurdistanekeyî azad û serbixoyî û dimokrat da xirkidiwetewe, çunku PKK erekî mezîni berpa kirdiwe diji peywendiya feodalcan û xêlekiyekan ke em peywendiya kona pe-restiyane bunete asteng le berdem jinanî Kurdistan û mafekanyan durxistneweyan le korî xebat.

Jinî Kurd le jêraberayeti PKK da nek her tewaniweti bajdarî le xebatî rizgarî niştîmanî neteweyîda hikin, belku be karî mejuy xoyan hestawan û cigayî jinanî Kurdyan le komalgayî Kurdîda desnî an

kirdiwe. Jinî Kurd dezanêt ke piyaw nakarêt bibete dem rast û dawayî mafekani jin û serbestiyani bikat eger jinî Kurd xoy bem kara halnêstêt. Çunku Kurdistan tenha mulkî piyawî Kurd niye milki jinanî Kurdistanî e, her em xebate e ke tirsekî mezîni xisawete ber dem dagirkarani Kurdistan.

PKK tenya ew mafey be jin nedawe ke bajdarî le ore da bikat û bes, belku jinî kirdiwete layenki lepirsrawî. Ew gir û griftaney (problem) ke aradaye le her yekêk le perçekanî Kurdistande le pê hem uyanda gir û griftî jin, çareserkirdinyan na iyawe le jêr çepokî kolonyalis û bê ganeda, komelgayî Kurdistan xo be xo bejnu piyaw genç û zarok ewa derwanêt çareserî em gir û griftane bikat û îwazi dimokratî be dest bihênêt, be girêdan legal ore î dimokratî da, bêguman jinî Kurd debêt yekemrolî em hengawe binên, be bê hengaw û xebatî jinî Kurd nakirêt em ori a be ser bikewêt.

Jinanî Kurdistan dekarên bibne hewên û nimune bo jinanî gelanî welat dagirkarekani Kurdistan û gelanî çihan, seretay destpêkirdinî em hengawe piroye jinanî Kurd newyane, le ore î rizgarî niştîmanî da ke be eke le rizgarbunî mirowe çewsaewekanî em serzemîne lejêr rabirayeti PKK da. Jinanî Kurdistan em ro bunete duristkarî dîrokî nuwê, bunete pê eng le dest çewsandînewe û çiray ro enî xebatî jinî Kurd ro duwayroj degate hemu keteberêkî tarîkî elm çihane. Jinanî Kurd rolekî mezinyan piyade kird le damezerandîni parlemani Neteweyî Gelî Kurdistan. Jinî Kurd be giyanêkî mirowayetiyanew ore get û welatparêzî û robe-roj gelek erkî mejuy giring buwe ke bew perî azayeti û burwabexokirdînewe berengari em erke mejuyiye buwewe le parlemani neteweyda layenki berpirsiyarî giringî girte estoxoy ke dupatyan kirdewe, kenek tenya le hilbijartinde belku bo mafî bejdarkirdinî le derkirdinî biryarî yasa û rêsekanî gelî Kurdistanî da.

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1-Ji serekên Eşîreke Kurd bû. Tevlî xebatên Xoybûnê bû û serokatiya Cemiyeta Belengaz-i Hayriye kir. Di wê nê de tê dîtîn/ Serokê Katolikên dinyayê, li Vatîkanê rûdinê 2-Maqûl, mirovê hêja/ Cehe-nem 3-Birêveçûna serxweşan/ Pîrtî 4-Kinnivîsîna rêxistineke Îrlandî/ Ji bo xwarin û vexwarinan mejûya bikaranîna dawî/ Tebar, xwelî 5-Sîng/ Di riyên navneteweyî de plakeya Tirkîyê/ Koma eşqiyayan 6-Beşek ji milê mirov/ Qey 7-Ji bo xwedîkirina teyr û çûkan tê bikaranîn 8-Dema bi hîdrojenê re bibe yek av çê dibe, wek element sembola wê 'O' ye 9-İstîqbal 10-Salnameya îslamî ku li gor heyvê hatiye amadekirin/ Navê rojêkê

Serejêr: 1-Xwarinek/ Navê çemeke mezîni li Rûsyayê 2-Berhem 3-Rêncberî/ Navê rêxistineke polîsî ya bi taybetî û Amerîkayî 4-Kemax, qalçe/ Rêbir, hesad 5-Navê pêxemberê ku li gor hin baweriyên olî, bavê hemû insanan e/ Ê bi zerî ve 6-Kesên ji Eşîra Xiyân/ Bi Tirkî kûçik/ Dek, hîle 7-Memûriyet 8-Edalet/ Yekemîn, pêşik/ Dema were serê peyvan, wateya herî pîr dide peyvê 9-Sinif 10-Propaganda 11-Riziyayî, xerabûyî 12-Dengweş, di telefonê

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												

de, navgîna ku mirov dide ber guhên xwe
BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYI
 Çeperast: 1-Huseyîn Deniz 2-Asîman/ Ah/ Sê 3-Vala/ Ap/ Mîad 4-Edalet 5-Yekem/ Leqat 6-NY/ Reb 7-Wate 8-Laborant 9-Enîşk/ Yi 10-Sî/ Ban
 Serejêr: 1-Haveyn/ Lec 2-USA/ Eywan 3-Silek/ Abis 4-Ema/ Ertoşî 5-Ya/ Em/ Erk 6-Înad 7-Pale/ NYA 8-Da/ Lebitîn 9-Ehmeq 10-Îta 11-Îsa 12-Zêde

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:
 Paşnav:
 Navnîşan:
 Bedelê abonetiye razînin:
 Li Tirkîyê û li derve: Y. Serhat Bucak
 İş Bankası Cağaloğlu Şub.
 Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevli kopyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16
 Kat:3 Nö:301 Cağaloğlu /İstanbul
 Tel (fax): 512 12 87

Mercên abonetiye:	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Bi zarokê şoreşê re hevpeyvîn

'Mêro, ku tivinga xwe bidim te tê min bikujî?'

Eyubo li Misircê, zarokê biçûk e lê navdar e. Bi cesaret û welatparêziya xwe tê nas-kirin. Naçe mektebê, sebebê neçûna xwe ji me re dirêj dirêj fîne ziman.

Eyubo ji vêga ve çav berdaye gerlatiyê. Di xeyala wî de kumandariyê gerîla heye. Bi rastî ev hêviya wî jê ne dîr e. Ji ber ku hê di vî temenê (emrê) xwe de dide xuyakirin ku xwedî şexsiyeteke karîzmatîk e. Ji vêga ve dikare grubek zarok bide pey xwe û li gor daxwazên xwe wan bibê û bîne. Bi rastî hemû zarokên Kurdistanê di şertên îro de, divê nevé bi pêş ve diçin û xwedî rihekî têkoşer in, lê yê wek Eyubo xwedî însiyatîf dîsa jî ne zêde ne. Ji ber vê yekê Eyubo bala me kişand û me pêwîst dît em pê re hinek sohbet bikin.

Tu kî yî?

- Ez Eyub im, ji min re dibêjin Eyubo.

Tu diçî mektebê?

- Na.

Çima?

- Ê jixwe.

Bavê te tu neşandî mektebê?

- Na, bavê min ez dişandim jî, ez neçûm.

Kêfa te ji mektebê re nayê?

- Na, ezê çî bikim ji mektebê, ku çentê min tune be. Heta vêga bavê min ji min re çente nedikirî, lê saleke din wê bavê min çenteyekî ji min re bikirre, ezê jî herim mektebê.

Pişî mektebê tê çî bikî?

- Gava mekteba xwe xelas bikim, ezê herim ba he-

valan.

Heval kî ne?

- Apo ne.

Apo kî ne?

- Ew jî heval in.

Ew çî dikin?

- Diçine çolê.

Ji bo çî?

- Li wirê radizên, leşkeran dikujin, diçin li wan deran dileyizin ji xwe re.

Çima leşkeran dikujin?

- Leşker neyarê wan in.

Wekî din kî ne neyarê wan?

- Leşker in, fîm in, MÎT in, polis in, koricî ne neyarê wan. Rika min zehf ji MÎTê tê.

MÎT çî ye?

- Ji bîra min çûye navê wan, lê zehf pîs in, dijmin in.

Tê kengê herî ba hevalan û bibî gerîla?

- Gava bibime deh salî.

Ma tu dikarî tivingê bidî milê xwe?

- Erê, ezê çima nikaribim bidim milê xwe! Ev e mehek heye, carekê min çifte ji malê anî ez û Qaso bûn (Qaso hevalekî wî yê pênc-şes salî ye). Em çûn, çûn, çûn heta piştê Bêkende (Gundekî ji Misircê 7 km dûr e)

Hûn çûne çî?

- Em çûne cem hevalan.

We heval dît in?

- Na

Êê?

- Paşî, birayê min û yê Qaso hatin em ji wir anîn.

Ku we heval dîtibana, dê we çî bikira?

- Emê li ba hevalan bimana û êdî em nedihat in.

Eyubo, dibêjin carekê te rîya leşkeran birrîbû, ka beh-

sa vê mesela xwe bike.

- Leşker di rîya nêzikî mala me re derbas dibûn. Min baz da çû çifteya bavê xwe ji malê anî û ez çûm pêşiya wan, du leşker bûn. Min berê çifteyê da wan û ji wan re got, teslim bibin û min ji wan re got destê xwe hildin he-wayê. Wan negot bijî Apo. Min ji wan re got, "söyleyin bijî Apo", lê negotin û reviyân, keniyân û çûn.

Ku leşkeran li te bidana, wê te çî bikira?

- Qey dikaribûn! Minê jî çifte berdabûya wan.

Leşker û polis jêhatî ne, an gerîla?

- Heval û Apo jêhatî ne.

Tu Apo nas dikî?

- Erê, Egî e.

Kî ye? (Bi vê pîrsa min re wî dest bi stranekê kir)

- Serok Apo, billind Apo, mezin Apo, ronahî da gelê me, tu her bijî Apê me.

Tu bi hevalê xwe re, kîjan listikan dileyizî?

- Gava em bi hev re dileyizin, ez dibim heval û hinek jî dibin polis û MÎT. Em polis û MÎT'an dikujin, ew nikarin me bikujin.

Bavê te çî karî (îşî) dike?

- Bavê min îş nake, betal e, carna diçe Stenbolê xaniyan çêdike, wisa pereyan fîne, incax em tiştan dikirrin û dixwin.

Çend bira û xwişkên te hene?

- Em tev, bi diya min û bavê min re heft heb in.

Tu bi Tirkî dizanî?

- Hinek dizanim.

Tirkî li xweşê te tê?

- Erê

Çima?

- Ê ne ez bi Tirkî ji leşkeran re dibêjim, "Söyle Serok Apo, konu!" Ez ji leşkeran re dibêjim, "Yavrum hele gel buraya!" Ew jî dibêjin "Ne" (Eyub li vir maneya "ne" ji min re dibêje) Yanî dibêjin "Çi ye!" Ku wan digot, "Ne!" Min digot, "Leşker, leşker anene"

Li te nedidan?

- Qey dikarin! Ku li min bidana minê wisa çifteyek berdabûya wan, wisa kiriba ku diyan wan şîna wan kiriba.

Hevalên te çawa ne, çî ne?

- Hevalên min hemû Apo ne, hemû heval in.

Kêfa te ji kîjan (baciye) stranê re tê?

- Ya Egî, ya Apo, ya Şehrîban. Ya Serok Apo jî zanim, ya Newrozê jî zanim.

Newroz çî ye?

- Newroz?! Himm, dibêjin Newroz û Newroza me ye, bihar û sersala me ye, govend û dilana me ye, bona xertikê, xeriyê me ye.

Maneya Newrozê çî ye?

- Agir dikin li serê çîyan, diçin tekellik û darikan fînin dişewitînin. Em darik û tekellan didizin û dişewitînin.

Hûn çima wan dişewitînin?

- Ji bo Newrozê.

Tu kîjan partiyên nas dikî?

- Ya Apo, ya Egî, ya serhildan.

Navê partiya Apo çî ye?

- Egî e.

PKK çî ye?

- Hemû ji bîra min çûye.

Tu nizanî PKK par tiya kê ye?

- Belê, ew partiya Apo ye. Tu kîjan serokên Kurdan nas dikî?

- Apo, Egî, Şehrîban, êdî ewên din ji bîra min çûne.

Berzanî kî ye?

- Nizanim.

Telabanî?

- Nas nakim.

Yilmaz Güney?

- Wele nas nakim.

Leyla Zana?



Eyub: "Gava mekteba xwe xelas bikim, ezê herim ba hevalan."

- Leyla keça Kurda ye, ew pîr hêja ye.

Apo?

- Ew zehf mezin e, ew serok e û heval e. Birayê min ê biçûk jî Apo ye. Ew hema hîna 4 salî ye. Ew dibêje, "Aho Aho" û wisa dike (destê xwe hildide û îşareta serfiraziyê nîşan dide)

Birayê te yê biçûk çima dibêje, "Aho Aho", yanî maneya Aho Aho çî ye?

- Ê ne ew dixwaze bibêje Apo Apo, lê nizane bibêje incax dibêje Aho Aho.

Tu çima bûyî Apoçî?

- Çima bibim ji aliyê Tirkan.

Tirk çî ne?

- Leşker û polis in.

Polis jî Tirk in?

- Erê, MÎT jî.


Tu zanî koricî (cerdevan) jî çî ne?

- Erê ez zanim, ew kûçikê leşkeran e.

Eyub, mesele an jî gotineke te ya din heye tu ji me re bibêjî?

- Na, ka bisekine, ka bisekine tiştê hate bîra min. Carekê ez û Ersîn û Hiseyn û Zahir, em çûne ba qereqolê, me got "Serok Apo" leşkeran jî berê tivingên xwe dane me, incax newêribûn berd in me. Hiseyno kevirêk li piyê leşkerekî da, piyê wî şikand. Lê piyê wî ne şikest. Ji leşker re got, "Ka tivinga xwe bide min." Leşker jî got, "Mêro ku ez tivinga xwe bidim te, tê min bikujî!"

Hevpeyvîn: Bahoz Rojava



"Carekê min çifte ji malê anî, ez û Qaso bûn. Em çûn, çûn, çûn heta Bêkendê."

Bêdengiya tirsra 70 salan ên hindikahiyên (egalîte, azinlik) li Stenbolê, xwe di manşetên rojnameyên ku bi zimanên xwe diweşînin de, diyar dike. Di rûpelên rojnameyên Ermenî û Rûm de, bi pirranî xemgînî tê xwendin. Nûçeyên dîrketinê, bi îlanên mirinê temam dibin. Yorgo'yê ji Ortakoyê, mirina Marîka ya ji Nîşantaşi, ji rojnameya du rûpelî Îho hîn dibe.

Bi îlana Meşrutiyeta Duddyan, bi pesta dewletên Ewrûpî ya li ser Osmanîyan, li Enedolê, Kurdistanê û Stenbolê bi sedan rojnameyên Rûm û Ermenî hatin weşandin. Li gor agahiyên Pars Tuğlaci dide me, -ku der barê hindikahiyên de, bi lêkolînên xwe tê nasîn- hejmara kovar û rojnameyên bi Ermenî yê di navbera salên 1908 û 1938'an de, hatine weşandin 65 e. Ên bi Rûmkî jî 36 in. Di wê demê de, Yahûdiyên Tirkiyê ku zimanê Judeo-Espanyol bi kar tinin jî 6 rojname weşandin.

Li Stenbolê ku yek ji paytextên çandî yê dinyayê dihate hesabîn, ev tevgerên girîng ên çandî, piştî bi demeke kurt ber bi tunebûnê ve çûn. Kuva-î Miliyeciyan ku bi hilweşîna Osmanî re derketin holê, celebeke politîkayên qirkirin û sirgûnê ku li hember gelê Kurd dimeşandin, li hember hindikahiyên Rûm û Ermenî jî ceribandin.

Bi peymanê Lozanê re ku gelek mafên hindikahiyên kiribû bin mîsogeriyê (garantiyê), di dema komarê de, li hember van gelan dijminatîyeke millî xwedî kirin. Û vê dijminatîyê bi awayên cure cure derbasî jiyane kirin. Ji bo koçberkirina hindikahiyên Ermenî û Rûm, hemû pestan pêk anîn.

Mînak, di dema ku Partiya Demokrat (DP) li iktidarê bû, bi hinceta rewşa Tirkên li Qibrîsê, li Stenbolê avahiyên Rûman hatin şewitandin. Zilmên wisa pêk hatin ku, di êrişên ser

Manşetên bêdeng



Li Stenbolê rojnameyên Rûm û Ermenîyan Mem Baran

malên Rûman de, teçawuzê pîrekên wan kirin. Dêran rûxandin (hilweşandin- xerakirin). Sînor dane ber perwerdekirina bi zimanên hindikahiyên ku li gor Lozanê hatibû ser û berkirin. Di encamê de, dewlet ev koçberiya ku dixwest, bi dest xist.

Îro ji wan Rûmên ku di dema avakirina Komara Tirk de, şênîya (nifûs) wan digihîşte milyon û nîvî, 1500-2000 kes mane. Ev koçberî tesîra xwe li çapemeniya hindikahiyên jî kiriyê.

ERMENIYÊN JI NIFŞA DUDUYAN ASÎMILE NE

Îro li Stenbolê, ji wan bi sedan weşanên hindikahiyên, rojnameyên bi Ermenî Jamanak û Marmara, bi Rûmî Apoyevmatîni û Îho mane. Tîraja van 4 rojnameyan jî nêzîkî 3 hezarî ye.

Xwediyê rojnameya Jamanak'ê ku 81 sal e tê weşandin û wek rojnameya herî kevin tê nasîn, Ara

Koçunyan, dema der barê rojnameyê de agahî dide, ji civata Ermenîyan gelek giliyên xwe dike. Koçunyan, helandina Ermeniyên li Stenbolê diyar dike û wiha dibêje: "Ermeniyên ji nifşa (nesîl) duduyan, bi temamî asîmîle bûne. Ji çanda xwe û zimanê xwe re bûne biyanî. Rojnameya me, bi îlanên mirinan û dêran li pê dimîne. Em dengê civata xwe û navgîna ragihandinê ya wê ne. Ji ber vê jî, divê em tevî hemû astengiyan bijîn."

Ara Koçunyan, bersiva pîrsa me ya, der barê siyasetê weşanê ya rojnameyê wiha dide: "Em hê jî, ji bo jiyandina çanda civata xwe weşanê dikin. Nûçeyan ji civata Ermenî didin. Bi vî awayî jî, civata me ya biçûk, ji hev agahdar dibin. Di gel vê yekê, nûçeyên der barê civata Ermeniyên li dinyayê jî, têne weşandin. Wekî din car bi car, ji bo xwendevanên ku bi tenê rojnameya me dikirin, nûçeyên ji Tirkiyê jî bi kurtî têne weşandin."

"DI BEROŞE DE DIPÊJIN DI DEWANGÊ DE DIXWIN"

Apoyevmatîniya ku bi Rûmkî tê weşandin jî, pîrsgirêkên weke yê Jamanakê dijî. Ev rojnameya ku ji sala 1925'an ve tê weşandin jî, bi pirranî rûpelên xwe ji pîrsgirêkên Rûmên ku li Stenbolê dijîn re, vekiriyê. Bi giştî der barê civaka Rûm de, nûçeyên civatî têne weşandin. Îlanên mirinan, ên zewacan bi zêdeyî cihê xwe digirin. Car bi car, der barê Rûmên dinyayê de jî nûçe dertên. Rûpelên çand û edebiyatê jî, gelek bala xwendevanên wê dikişîne. Xwediyê rojnameyê ji malbata Adasoğlu Vasil Adasoğlu, bê navberdayîn weşandina Apoyevmatîni, weke serkeftînekê dinirxîne. Adasoğlu, der barê rojnameya xwe de, van agahiyên dide: "Em bi Îho re, ji bo bibin guh û çavê civatê dixebitin. Astengiya me ya herî mezin, pîrsgirêka aborî ye. Ji ber ku her diçe xwendevanên rojnameyê kêmtir di-

bin, em bi îlanên, jiyana xwe didomînin. Di rojnameya me de, bi pirranî nûçeyên dêran û îlan cih digirin. Di gel vê yekê, em hemû nûçeyên ku civata me têkildar dikin diweşînin."

RAMBETİKO: XEMGÎNIYA RÛMAN, ZILMA KEMALİZMÊ YE

Dema me li nûnerên çapemeniya hindikahiyên guhdarî dikir, fîlma Rambetîko dihate hişê me. Ew fîlmê ku qala Rûmên Egeyê dikir û tê de muzîka wan a heremî lê didan û dileyîstin. Rûmên Îzmîrê, yên ku di bin postalên Kuvay-î Milliyciyan de, hatin pelçiqandin, ji Atîna, ta Amerîkayê ber bi rêwîtiyêke bêdawî ve meşîyan û sermiyanê wan bi tenê hebû, ew jî, ew Rambetîkoya ku ji Enedolê bi xwe re biribûn bû. Ew Rambetîkoya ku bi dijîti û evîne hatibû xwedîkirin, bi qetlîamên kemalîzmê, bêhtir bû hundirîn û bû zimanê mirinê. Lê ji bilî ew Rûmên ku ji avêtina behrê filitîn, tu kes wê fêhm nake. Îro, ew salonên ku lê Rambetîko têne xwendin vala ne. Ew Marîke ya ku xwe bi xwendin û lêdana Rambetîko xwedî dike û ew û mirinê hevûdin di tenêbûna wan bajarên dîr de hembêz dikin, dixwaze careke din vegere ew Îzmîra ku lê Rambetîko dixwend. Lê, xeyalên wê, di vê serdanê de bêhtir dişikên. Leşkerên Atatürk, ew şopên ku li dû xwe hiştibûn hemûyan tune kirine. Ew qehwexaneyên ku lê Rambetîko dixwendin, bi carekê xera kirine. Kemalîzm, ne tenê wan mirovên delal, lê hemû şopa wan jî, avêtibû behrê. Marîka, fêhm dike ku li vî bajarî, jê re mezelekê jî tune ku xwe têxê. Rambetîko, êdî biyaniya Îzmîrê ye jî. Ev bajar jî êdî ji Rambetîko fêhm nake.

Rambetîko, êdî xemgîniya Marîka ye.

Rambetîko, îro bêdengiya çapemeniya hindikahiyên jî tîne ziman an na?